Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1349 | 8-Sibat-2026 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# ‘Şehîdên me her tim zindî ne’

Ayşa Silêman/ Dêrik

**Wênesazên jin di Peymangeha Bilind a Hunerê de diyar kirin ku gelê kurd di hemû cûreyên jiyanê de girêdana xwe bi ax, welat û şehîdên xwe ve nîşan didin û wiha gotin: “Me xwest em vê tabloyê xêz bikin, da ku ji her kesî re bidin xuyakirin ku şehîd her tim zindî ne.”**

3 jinên ciwan ku cihê xwe di beşê wênesaziyê de digirin li Peymangeha Bilind A Hunerê li bajarê Dêrikê, bi riya firçeya xêzkirinê xwestin ji hemû cîhanê re wêneyên qehremanê nemir Ziyad û hevalên wî yên ku bi lehengî li Şêxmeqsûdê berxwedanî kirin, xêz bikin.

Di derbarê xêzkirina xwendakarên Peymangeha Bilind A Hunerê ji tabloya şehîdan re xwendekarên bi bavê Macîde Xelef, Şêrîn Mihemed û Mereh Elezîz ji Rojnameya me re axivîn.



Macîda Xelef



Şêrîn Mihemed



Mereh Elezîz

**‘Wênesaz firçeya wî çeka wî ye’**

Xwendekara bi navê Macîda Xelef da zanîn ku ew ji Serê Kaniyê ye lê li Kobanê dijî û niha jî xwendekara sala yekê ye di Peymangeha Bilind A hunerê de cih digre û wiha got: “Me xwest bi riya vê tabloyê re hestên xwe ji bo şehîdan nîşan bidin, ji ber ku wênesaz firçeya wî çeka wî ye bi riya hunerê em nameyê dighînin civakê. Em êşa malbatên şehîdan hildigrin û bi riya xêz kirinê dihûnînin. Ev cara yekem bû ku ez tabloyeke bi vê êşê xêz dikim, hestên ku di hundirê min de heyî û min ne dikarî ji derdorê re ragihînim, min bi riya vê tabloyê derxist. Em hertim deyîndarên şehîdên xwe ne, ji ber ku ked û têkoşîna ku ew ji bo vê axê dikin cihê rûmet û serbilindahiyê ye. Huner derfetê dide me ku em hest û nêrînên xwe bînin ziman bê ku em biaxivin, nameya min ji gelê kurd re ew e ku her yek ji me bi rengekî cûda êşa şehadetê hildigre û bi riya vê tebloyê cîhanê giştî zanî ku şehîd her zindî ne û tucarî namirin.”

**‘Heya dawiyê em ê li ser şopa şehîdên xwe bin’**

Xwendekara bi navê Şêrîn Mihemed anî ziman ku ew û du hevalên xwe tabloyeke ku bi wêneyên şehîd Ziyad û hevalên wî xemilandî xêz kirin û wiha got: “Dema me berxwedanî û cesareta fermandar Ziyad dît me hêz jê girt lewma şehadeta wî bandor li me kir û birînek di hundirê me de çêkir. Min û her du hevalên xwe biryar dan ku em peyamekî bighînin cîhanê ku şehîdên me ne tenê hijmarin, lê ew hertim di bîra mirov de dimînin. Di tabloya me de her rengek wateyekî dide, bêtirî xwe rengê tarî têdeye ew tê wateya ku em xemgînin ji bo şehadeta hevalên xwe, di heman demê de di tabloya me de ronahî jî heye tê wateya hîn hêviya me heye. Bila herkes bizanibe her gaveke ku tavêjin li ser vê axê bi saya berxwedaniya van şervanên me ye. Niha jî çete dixwazin gorên van pekrewanan xira bikin, ev tê wateya ku ji gorên me jî ditirsin. Heya dawiyê em ê li ser şehîdên xwe bin û tucarî Bernadin.”

**‘Her mirovek xwedî hest û derbirîneke cûda ye’**

Xwendekara bi navê Mereh Elezîz diyar kir ku ew ji bajarê Qamişlo ye û li Peymangeha Bilind a Huner beşê wênesaziyê dixwîne û wiha got: “Her mirovek xwedî hest û derbirîneke cûda ye, em jî wek xwendekarên hunerê hestê xwe bi riya xêzkirinê derdixin. Me xwest em ji cîhanê re ragihînin ku gelê kurd di çi êş û azarê re derbas bû û tevî wilo jî berxwedaniyeke bê hempa dan meşandin û canê xwe ji bo axa welat feda kirin. Ji bo me ev tablo cihê serbilindahiyê bû ji ber ku gelek kes hebûn ji derveyî welat bûn tabloya me li ser malperên xwe belav kiribûn û gelek nivîsên bi zimanên cûda xwedî wate jî li ser xêz kiribûn. Raste tabloyeke biçûke lê xwedî peyameke girîng bû ku me bi riya wê dengê xwe gihand cîhanê.”

## FERHENGA BIWÊJAN

**Qijik nikulê xwe lê bixe piçek goşt dêv ve nayê:**
- Bi heman wateyê.

**Ruh tê de nemaye/ruh tê de nîne:**
- Pir lewaz bûye.

**(Hem ji bo zîndewer hem ji bo ne zîndeweran tê gotin)**

**Seyê derzîdayî ye:**
- Pir lewaz bûye; goşt li ser nemaye; jar û belengaz bûye.

**(Hinek kes derziyê dixin nava nên û didin kûçik; kûçik ji ber lewaz dibe heta ku dimire)**

**Tu dibêjî qey nanê ceyî xwariye:**
- Ji bo kesê pir lewaz tê gotin.

**Tu dibêjî qey li ser didanekî çêriyaye:**
- Pir lewaz e; hindik maye ku ji birçiya bimire.

**Zik û pişt bûne yek:**
- Pir lewaz bûye; piçek goşt li ser nemaye; hindik maye ji lewazî bimire.

**LI SER XIRABIYA PIŞTÎ QENCIYÊ**

**Çêleka zer e:**
- Qenciyê dike lê pişt re xirabiyê dike; tiştên pir baş dike lê pişt re xirab dike. (31)

**Çêleka sor e:**
- Bi heman wateyê.

**Ew çi şîr e te da, ew çi pehîn e te lê da:**
- Qenciya te bi kêrî tiştekî nehat; qenciya te bi avê de çû; tu qenciyê dikî pişt re jî xirabiyê dikî; tiştên tu dikî hev nagirin.

**Şîr dide paşê lingê xwe lê dide dirijîne:**
- Bi heman wateyê.

**Tirba dayê xweş çekir, lê li kêleka we rît:**
- Heta tiştekî baş dike yekî xirab dike.

**LI SER SAXLEMIYA KAR**

**Li çêlekê binêre û bidoşe:**
- Baş lê binêre paşê danûstandinê pê re bike.

**Lê binêre û bidoşe:**
- Bi heman wateyê.

**Rayên wî dadikevin ser quloçê gamasî:**
- Bingehê wî pir kûr û xurt e.

**Rayên xwe berdane erdê:**
- Karê wî saxlem e; pişta wî qayîm e.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî




## Gotina Dawî



### Bila çavên we li ser Kobanê bin!

Mihemed Seydi

Ev zêdetirî 20 rojan e ku bajarê Kobanê ji aliyê DAIŞ’ê ve dorpêçkiriye. Elektirîk hatiye qutkirin û pêre jî av nagihêje xelkê. Xwarin û vexwarin kêm bûye û Dermanê gelek nexweşiyan jî nayê peydakirin. Ji ber dunya gelekî sare, ji bo germkirinê jî kêmbûna sotemeniyê bûye pirsgirêk. Herwiha pirsgirêkên peywendiya bi derve re jî heye, ji ber internêt ji roja êrişan dest pê kiriye ve qut e.

Ji ber nexweşxane û bijîşk kêmin, Kobaniyan ji bo rewşên lezgîn û emeliyatên xeter jî berê xwe didan nexweşxaneyên Şam an jî Helebê, lê ji ber rê girtî ne, ev jî dibe sedema xeteriya li ser jiyana gelek kesan. Ji ber di warê leşkerî de nikaribûn nêzî Kobanê bibin, dixwazin kobaniyan bi vî awayî bişkînin. Li dora Kobanê careke din DAIŞ kom kirine ku navê wan vê carê kirine artêşa dewleta sûriyê. Helwestên ku bi riya qaşo rojnamevanin derdikevin û dibêjin nêz bûye ku wê bikevin Kobanê, dide xuyakirin ku ev bajarê pêşiyên wan DAIŞ têk bir, bûye Kelem di çavên wan de. Her çiqasî li hevkirin di navbera Kurdan û Şamê de çêbûbe, lê li ser erdê li dora Kobanê dorpêç didome. Li gundên Kurdan ku artêşa Colanî ketinê, talanî, wêranî û dizî di bin navê xenîmeyan de didome. Hin vidyoyên ku belav bûn, dide diyarkirin ku çawa ketine mal û dikanên Kurdan û her tişt wêran kirine û dizîne û yê nekarîne bibin jî xerab kirine. Lê xelkê Kobanê yê ku berê rastî komkujiyan hatiye, bi tu awayî baweriya xwe bi van çeteyan û gurûpan nake û lewma rê nehat dayîn ku derbasî herêma wan bibin. Niha li nava her kolanê û taxê li ber her derî nobet tê girtin û bala herî zêde jî li ser sînorê ku çete di aliyê dewleta Tirk re derbas nebin. Ji xwe di sala 2014’an de jî dewleta Tirk DAIŞ di sînore derbas kir û xwest hîne jî derbas bike da Kobanê bikeve, lê ji ber Kurdan li ser sînor nobet digirt, nekarîbûn. Tevî ku di çarçoveya lihevkirinê de şandeyek ji Kobanê çû Helebê da ku dorpêç were rakirin, lê heta niha tu encameke diyar û li ber çavan derneketiye.


Di vê navberê de, Bijîşkên Kobanê hişyariya nexweşiya di nava zarokên Kobanê de da, ku ew jî ji ber nebûna ava paqij derketiye. Ji bo vê, diviya bû aliyên siyasî di vê derbarê de rojane daxuyaniyek bidana û raya giştî ji vê rewşa xeternak agahdar bikirana, lê heta niha zêde nehatiye kirin. Belkî sedemên xwe yên din hebin ku ev rewş zêde nakeve rojeva aliyan, lê divê çapemenî û rojnamevan vê rewşê zêdetir parve bikin da çavê her kesî biçe ser vî bajarî ku Terora Cîhanî li dîwarên wê têk çû. Ji hundirê bajar nikare zêde agahî were girtin, lê divê ji der ve de bikeve rojeva her Kurdekî. Kobanê bi erdîngariya xwe biçûke, lê bi şehîd û berxwedana xwe pir mezin û bi qîmete. Divê her kes li her deverê wekî 2014’an lê xwedî derkeve û destek bide da nebe qurbana bazarên navdewletî. Da nekeve destê yên ku li bendê bûn berê bikeve û niha jî bixînin. Zarokên Kurdan ên li Kobanê şehîd bûn, wesîyet kirin ku ev bajar nekeve destê neyar û dijminan. Divê ji bo Kobanê dilê her kesî lêbide, divê çavê her kesî li Kobanê be. Cangoriyên li goristana Kobanê, Kobanê diyarî Kurdan kirin da lê xwedî derkevin. Bila çavê Kurdan li Kobanê be! Kobanê ji bîr nekin!

## ‘Divê xweparastin û Şerê Gelê Şoreşgerî xurt be’



Welatiyên gundê Girbawî diyar kirin ku di 29’ê Çileya 2026`an de ji aliyê hikumeta demkî û Hêzên Sûriya Demokratîk ve peymanek ji mafê kurdan hat îmze kirin...**R-3**

## ‘Alîkarî ne madî bû, gihandina hêvî û palpiştiya hev bû’



Endamê Dezgeha Xêrxwaziya Berzanî Rawaj Hacî da zanîn ku nêzî 350’î kamyonên alîkariyê û 150’î karmend derbasî Rojava bûne û got: “Ji gelek aliyan ve alîkarî bo Rojava hat, herwiha biryara derbaskirina alîkariyê ne tenê madî bû, gihandina hêvî û palpiştiya hev bû.”**R-7**

## Ji çiraxên wêjeya Kurdî



Nivîskara Kurd Lema Elî dengê jina Kurd ya ku ji êşê hêviyek hûnand û ji bêdengîyê awazek afirand.**R-9**

## ‘Berxwedana Rojava yekrêziya gelê Kurd li Kurdistanê û cîhanê pêk anî’



Hevserokê KNK’ê Ehmed Karamûs diyar kir ku Kurd di qonaxa hebûn û tunebûna de ne, ji bo wê divê hemû partî û aliyên siyasî berpirsyariya xwe ya dîrokî ji bo Rojava pêk bînin...**R-4**

## Dayîka Şehîdekî û sê şervanan: Parastina nirxên Şoreşê erka me ye



Dayîka şehîdekî û sê şervanan Leyla Munîr ku ji pêkhateya Ereb e bi zarokên xwe re ji bo parastina nirxên şoreşê li kolanan çek hilgirtiye û parastinê dike. Leyla Munîr wiha dibêje: “Ez û kurên xwe yên şervan di parastina herêmê de dilsoz in.”**R-2**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1349 | 8-Sibat-2026 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# FORMA ALMANÎ-KURDÎ: WÊ PIŞTGIRIYA ME JI ROJAVA RE BERDEWAM BIKE

Serokê Forma Almanî-Kurdî Yûnis Behram da zanîn ku ji destpêka êrişên dawî li ser Rojava, Forma Almanî-Kurdî çalakiyên xwe li ser astên siyasî, medya û civakî zêde kir. Wê civînên rasterast bi parlamenterên Almanya û Ewropî re li dar xisitn, herwiha li ser rewşa mirovî û ewlehiyê ya herêmê dozên siyasî û hiqûqî pêşkêş kirin, di heman demê de ew beşdarî kampanyayên piştgiriyê, semîner û konferansan bûn da ku rastiya Rojava ji raya giştî ya Ewropayê re şirove bikin.**R-6**




## Ciwanên Kurd li Ewropayê piştgiriya Rojava dikin




Ciwanên Kurd yên li Ewropayê dan zanîn ku gelê Kurd li hemû qadên cîhanê bi yek deng û helwestê herikîn qadan, ew deng jî dengê doz û parastina xaka Kurdistanê ye. Herwiha tekez kirin ku ew ê bibin hêza piştgirî û gihandin dengê Rojava ji bo cîhanê.**R-10**



**Ev ax nabe ya dagirkeran**
Berîtan Xalid R-2



**Serkeftin Balansa Azwerî û Pratîkê Ye**
Idrîs Henan R-4



**Gelê Kurdistanê çi got?**
Ahmet Aktaş R-6

# Akademiya Jineolojî raporeke tawanên şer amade kirin

Akademiya Jineolojî ya Rojava raporeke berfireh amade kirine ku tê de binpêkirinên li ser mafên mirovan ên ku dewleta Tirk û komên çekdar ên Heyet Tahrir el-Şam (HTŞ) û DAIŞ'ê li herêmê kirine, pêşkêşî saziyên navnetewî dike.

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Akademiya Jineolojî ji bo derxistina rastiya kiryarên ku çeteyên HTŞ'ê bi alîkariya dewleta Tirk a dagirker li taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ya Helebê herwiha li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kirine dosyeke berfiref û bi belge amadekirine ji bo ku ji raya gîştî û saziyên nevneteweyî re pêşkêş bikin. Ev belgeya 34 rûpelî, ji bo dadgehên navnetewî, rêxistinên mafên mirovan û saziyên parastina zarokan hatiye amadekirin. Rapor bi taybetî êrişên sîstematîk ên li taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiye ya Helebê û herwiha li Hesekê, Qamişlo, Çilaxa, Kobanê, Reqa û Tebqayê digire dest. Di dosyayê de sernavên wekî hedefgirtina cihên niştecihên sivîlan, koçberkirina bi zorê, komkujî, gefxwarina li ser karkeran, revandin, berdana çeteyên DAIŞ'ê, guhertina demografiyê, binpêkirinên mafên zarok û jinan hene.

Ji êrişên li ser Helebê heya gund û bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, hefedgirtina sivîlan û bikaranîna çekên giran ên dewleta Tirk a dagirker (SÎHA, tank û top). Di heman demê de di belgeyê de wêneyên sivîlên hatine qetilkirin hene, di nav qurbaniyan de jin û zarok jî hene. Di dosyayê de dîrok, nav, cih û wêneyan bi hev re di yek belgeyê de hatine berhevkirin. Di vê çarçoveyê de Berdevka Akademiya Jineolojî Zehrîban Hisên ji Rojnameya me re axivî.



**''Ev belge wê ji bo saziyên navnetweyî were pêşkêş kirin''**

Zehrîban Hisên diyar kir ku Akademiya Jineolojî dosya rastiya bûyeran amade kiriye û wiha got:"Ji destpêka Çileya 2026'an heya vê dema ji taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê û pişt re li tevahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê rastî êrişên hovane yên ji aliyê HTŞ'ê ve û bi alîkariya dewleta Tirk a dagirker hate kirin di nava vê dosyê de tên dîtin û wê ji raya gîştî re were pêşkêş kirin. Di encama van êrişan de gelek sivîlan di nava wan de jin û zarokan jiyana xwe ji dest dan. Li ser vê esasê Akademiya Jineolojî xwest ku belgeyekî amade bike, ku tê de sûcên şer belge bike, ji kuştin, birîndarî, revandin, dîlgirtin herwiha hin kesên ku carenûsa wan haya vê kêliyê ne diyare, dosyekê amade bike ku têde qala hemû bûyeran bike. Belge bi zimanê Kurdî, Erebî, Tirkî û Ingilîzî hatiye amadekirin. Herwiha wê di dema pêş de bi hin zimanên dîtir were wergerkirin.

Ev belge wê ji bo dadgehên navneteweyî, Rêxistinên mafê mirovan, rêxistinê mafê zarokan û hwd re were pêşkêş kirin, ji bo rastiya bûyer û kiryarên ku li Rojavayê Kurdistanê hatiye jiyan kirin, ji aliyê her kesî ve were xuya kirin û şopandin. Helbet wê ev xebat heya dawiyê ji aliyê Akademiya Jineolijî ve were şopandin, heya ku mafê sivîlan a jiyanê tê hedefgiritin, em ê li peykevin û ji raya gîştî re rohnî bikin."

**''Kesên sûcdar kîne û bi çi armancê êriş dikin''**

Zehrîban Hisên destnîşan kir ku armanca wan rastiya ku niha li Bakur û Rojhilatê Sûriyê tê jiyankirin eşkere bikin û wiha pê de çû: "Armanca me ji bo vê xebata ku em demeşînin, ew e ku rastiya heyî li ser erdê tê jiyankirin, ji raya giştî re were parvekirin, ji ber ku gelek caran tenê ew xwe dispêrin palperên civakî û nûçeyan, ji bo ew vê heqîqetê nasbikin şopandina wan ji van palperan re ne têrkere. Li ser vê esasê pêwîst bû ku tewanên şer werin belgekirin û testbîtkirin. Herwiha kesên sûcdar kîne û bi çi armancê êriş dikin di hema demê de jenosîda ku li ser Kurdan careke din di 2026'an de hate kirin ji raya gîştî û ji bo hemû cîhanê were zelal kirin."

**''Di demê pêş de wê dosyeke din wê were amadekirin''**

Berdevka Akademiya Jineolojî Zehrîban Hisên axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Ev dosya ku hatiye amadekirin ne tenê ji bo em ji raya gîştî re pêşkêş bikin, lê belê ji bo em heya dawiyê van bûyeran bişopînin û hemû sivîlan bighînin mafê wan. Em vê xebatê didin meşandin da ku kesên rastî êrişê hatine, malê wan xerab bûye, zarokên wan jiyana xwe ji dest dane, jiyana wan ya ku hatiye werankirin careke din bikaribin mafê xwe bidest bixin. Herwiha di dema niha de ji aliyê Akademiya jineolojî ve dosyeke din tê amadekirin sûcên şer ên li ser zarokan tê kirin. Me belgeya yekemîn bi dawî kir, niha jî em li ser belgeya duyemîn kar dikin. Ev jî ji bo em bidin xuya kirin ku van êrişan bi xwe re çi anî û encama wê çi bû. Bi hezaran mirov ji ber van êrişan ji cih û warê xwe koçber bûne, guhertineke demografîk ya ku li ser herêmê tê ferzkirin, ev jî dubarekirin ji siyaseta Rêjîma Baas ya ku li ser Kurdan dihat ferz kirin ne."

## Dayîka Şehîdekî û sê şervanan: Parastina nirxên Şoreşê erka me ye

**Aryen Hesen/Qamişlo**

**Dayîka şehîdekî û sê şervanan Leyla Munîr ku ji pêkhateya Ereb e bi zarokên xwe re ji bo parastina nirxên şoreşê li kolanan çek hilgirtiye û parastinê dike. Leyla Munîr wiha dibêje: "Ez û kurên xwe yên şervan di parastina herêmê de dilsoz in."**

Di encama erişên çeteyên hikumeta demkî li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê herwiha ji ber nêzîkbûna xeteriyeke mezin Rêveberiya Xweser di 18'ê Çile de banga seferberiya gîştî kir. Bi banga Rêveberiya Xweser re ji 7 heya 70 salî tevlî vê seferberiyê bûn da ku destkeftiyên Şoreşa Rojava biparêzin. Herwiha gel li kêleka şervanên xwe bûn, di heman demê de di vê seferberiyê de jinan pêşengtî kir û roleke sereke lîstin.

Li Hesekê, ku hewildanên êriş û binpêkirina destkeftiyên şoreşa Rojava berdewam dike, li beramberî wê gelê Hesekê bi seknek xort û berxwedaniyek mezin piştgiriya hêzên xwe dike. Herwiha gel li Hesekê di heman demê de li tevahî Kantona Cizîrê û Kobanê bi rihê şerê Gelê Şoreşgerî parastina xwe dikin. Di vê şer û berxwedaniyê de rola jin mezin bû, jinan cihê xwe di eniya pêş de digirtin mînaka herî mazin jî Yêkîneyên Parastina Jin (YPJ) û Hêza Ewlekariya Hundirîn a Jin bû. Di heman demê ji jinên ciwan bigire heya jinên bi temen mezin çek hilgirtin ser milên xwe û bi zarokên xwe re daketin qadan ji bo parastina axê xwe bikin.



Di vê çarçoveyê de dayîka Şehîdekî û sê şervanan Leyla Munîr ku ji pêkhateya Erebe ji Rojnameya me re axivî.

**'Rola jin di berxwedanî û parastinê de'**

Leyla Munîr da zanîn ku ew ji pêkhateya Erebe, dayîka şehîdekî û sê şervana ye û wiha got: "Ez û kurên xwe yên şervan di parastina herêmê de dilsoz in. Min hilbijart ku têkoşîn û israr bi îradeyeke azad bi kurên xwe re li Hesekê di parastina destkeftiyên Şoreşa Rojava de cih bigirin. Herwiha jin ne tenê parastina zarokên xwe dike di heman demê de bi zarokên xwe yên şervan re parastina welatê xwe jî dikin. Ji roja destpêkê ya van êrişan de hemû jin li qada ne, rojane ji jinên ciwan heya ya bi temen mezin li kolana ne û parastina destkeftiyên xwe dikin."

**' Ezê hênaseya xwe ya dawiyê li kêleka şervanên xwe bim'**

Leyla Munîr destnîşan kir ku ji saetên serê sibê heta derengiya şevê jin derdikevin qadan û wiha domand: "Ez dayîka şehîdekî me, û sê xortên min hene ku niha li eniyên şer ên pêş li berxwedidin û ez jî li kêleka dayîkan berxwedaniya xwe berdewam dikim. Em ê bi hêzên xwe re bimînin û em ê wan nehêlin, her çend mirin were, an balafir li ser serê me bifirin jî, em ê venekişin û em ê paşve nekişin, ji ber ku paşvekişîna me tê wateya şikandina moralê keç û xortên me, em qet paş de venakşin û em destûra gav paşde avêtinê jî nadin. Erka me ew e ku em di her şert û mercê de heta hênaseya xwe ya dawiyê li pişta zarokên xwe bin û moralê wan bilind bikin."


**''Nirxên Şoreşa Rojava di me hemûyan de hatiye çandin''**

Leyla Munîr tekez kir ku gelek jin, di nav de dayikên şehîdan, piştgiriya zarok û şervanên xwe wek erkekî exlaqî û neteweyî dibînin û wiha pê de çû: "Her dayîkek û jinek di her kêliyê ku were xwastin de amade ne ku cihê xwe di her çeperî de bigirin. Ji ber ku di me hemûyan de nirxên şoreşê hatiye çandin, herwiha hemû hewildanên derxistina nakokiyan di navbera Kurd û Ereban de vala ye ji ber ku em pevçûnên ku diqewimin ne di navbera Kurd û Ereban de ye. Ez jineke Ereb im û ev şoreşa me ye, ya me hemûyan e. Şoreşa me qet nebûye şoreşa neteweyekî an jî pêkhateyekî, lê belê şoreşe Rojava şoreşa parastina mafê hemû pêkhate, ax mal û rûmeta tevahî mirovahiyê bû."

**''Berxwedanî hilbijartineke bê veger e''**

Leyla Munîr axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Berxwedaniya 14 salan nêyê şikestin, em di tu qonaxê de neşikestine û em ê berdewam bikin ku bi israreke mezin bisekinin û li berxwebidin. Çiqas dijminê me pir bin û rêya me dijwar be em ê bi israreke xort ji bo azadiyê bi serbikevin. Bi îradeyek bêhempa, jin û bi taybetî dayîkên şehîdan, berpirsiyariya parastina ax û rûmetê hildigirin ser milên xwe ku berxwedanî hilbijartineke bê veger e, ev şoreş şoreşek gelê yekgirtî ye, nayê şkandin û em di wê bawer de ne ku parastina welat berpirsiyariyek kolektîf e ku paşvekişandinê qebûl nake."

**Akademiya Jîneolojî**



### Ev ax nabe ya dagirkeran

İsyan Karadeniz

Jinên kurd ê pêşeng gotin em vê axê bernadin , ev ax nabe ya dagirkeran , ev ax wê bibe ya dayik û bavên şehîdan ,wê ev ax bibe destkeftiyên vî gelî . Şoreşa Rojava ku bi şoreşa Jin hat bi navkirin jinên dil pola wiha pêşegtî kir.

Şoreşa jin ne hema weke çîrokeke klasîke ku dixwaze mêjiyê mêrsalar biguhere , ew bi xwe şoreşa avakirina zanîna jinan ne.Mirov dikare bêje ev şoreş veguherînek dîrokî ye ku armanc jiyanê bi xwe veguherîne.

Ev şoreş li ser gelek bingehan hat avakirin , ji wan gera li civakek demokrat , rizgakirina jinan û jiyaneke wekhev. Jinên ku bûn pêşeng û aktorên esasî yên Şoreşa Rojava di heman demê de li mîrasa têkoşîn û berxwedana jinan ên hezarên salan jî xwedî derketin. Jin bi berxwedan û hêza xwe ya rêxistinkirî bûn kabûsa împarator û xwedayên serdemê û îlham dan jinên ku li azadiyê digerin. Jinan li Rojava di nava şoreşê de şoreş pêk anîn. Bêgûman Şoreşa Rojava piştî xebat û keda dehan salan pêş ket. Bi îlankirina şoreşê re, êrişên pir alî jî destpê kirin. Li hemberî van êrişan berxwedaneke dîrokî pêk hat û gelek berdêlên giran hatin dayin. Yên ku Berdêlên herî giran dan jî jin bûn. Ji ber ku diviyabû jin ne tenê li dijî êrişan, li dijî hemû dîwarên ku li dora hiş û mejiyên wan hatibûn danîn jî têbikoşiyana. Lewma karên wan gelek zehmet û barê wan giran bû.Şoreşa jin mêjiyê dewletê red kir , li ser bingehên bawerî û çandî hat avakirin .Li dijî zihniyeta ku jin tenê bi kêm tiştan girêdayîye mînak mal , şer kir û xweste her jinek bo xwe û hebûna xwe, nav û nasnameya xwe şer bike .Bi salan jinan hemberî zihniyeta Rêjîma Beesê serî rakir , bi ketina wê rêjîmê re jî êrişên dijî jinan nehatin rawestandin.Mînak bi hatina HTŞ'ê li ser hikumê vî welatî kirinê dijî jinan zêdetir bûn .Ji wan bêrêziya hember cenazeyên şervanan , lîstina bi cenazeyan , qutkirina keziyan , ev mînakên herî berbiçavin. Pirsa divê niha bê kirin ev e: êrîşên HTŞ û dewleta Tirk ser qada jin û nirx û destkeftiyên jinan tê çi watê û çima ev êriş tên kirin , bêguman êriş ne tesadufin , êriş rasterast nasname û fikira jina azad hefeg digre ,HTŞ û DAÎŞ şêweyê herî tazî, hov ê serdestiya mêr temsîl dikin. Ev zîhniyet, ku jinan wekî kole dibîne, her deverê ku îradeya jinan lê xuya ye hedef digire. Min destpêkê jî got , kiryarên wan ên li dijî jinan rastiya wan radixe ber çavan , yanî jinên kurd bi keziyên xwe tên naskirin , em bi van keziyan mezin bû , ne hema xemleke û ser bedenan hatiye berdan ew dîrokek têr û tijiye , lewma wer xuya kir ku jinên kurd ji bo xwe weke gef dibînin .Şerê ku îro tê kirin şerê hebûn û tunebûnê ye , ne şerekî di navbera du hêzan de ye , ev şerekî di navbera du awayên jiyanê ye , şerê di nava du pergalên exlaqî de ye , li aliyekî zihniyeta DAIŞ'ê ku dixwazin gelan qir bikin û li aliyekî Rêveberiyeke ku dixwaze hemû gelan hembêz bike , ji vir heta ezman ji hev cûda ne , ew alî tu ol û netewan qebûl nake û serjêkirina mirovan ji bo xwe weke serkeftinekî dibînin û kuştin li gel wan şêwayekî jiyanê ye . Ji ber vê yekê, tiştê ku li Rojava tê parastin ne tenê perçeyek axe ; ew îdîayek e li ser ka divê jiyan çawa were avakirin.Civak bêyî azadiya jinan nikare azad bibe û jiyan bêyî azadiya civakê nikare were sererast kirin.



# Çalakbûna komên çekdar li berava Efrîqayê

Ji destpêka sala 2026'an û vir ve, herêma berava Efrîqayê şahidiya zêdebûnek berbiçav di çalakiyên komên çekdar û gefan de bûye, di nava metirsiyên ku ev gef ji bandorên ewlehiyê karin bighêjin welatên cîran.

**Navenda Nûçeyan**

Gihaştina DAIŞ'ê di naveresta Nîcer de rewşeke rageşiyên herêmî derxistiye holê, bi taybet piştî êrişa ku balafirgeha Navneteweyî ya Niyamî hedef girt, hin çavdêr dibînin ku rêxistina DAIŞ'ê ji nû ve rêxistinkirina rêz û amûrên xwe li herêma berava Efrîqayê nîşan dide, ku ev yek şiyana wê ya derbasbûna di nav pergalên ewlehiyê de yên herêmê zêdetir dike.

Neteweyên Yekbûyî berî niha jî hişyarî dabû ku rewşa ewlehiyê li Rojavayê Efrîqayê û herêma beravê her ku diçe aloztir dibe û ji çarçoveya herêmî wêdetir diçe û dibe gefeke gerdûnî ya mezin, di demekê de ku Sekreterê Giştî Antonio Guterres fikarên xwe yên li ser vê xeteriyê ku herêmê bi tevahî tehdîd dike anîbû ziman.

Li navenda herêma beravê, Malî, Borkina Faso û Nîcer hîn jî welatên ku herî zêde rastî pevçûnên çekdarî tên, ku operasyonên terorîstî ji şêwaza şerê çekdarî yê kevneşopî wêdetir çûne û avahiyên serwer ên wekî baregehên leşkerî û balafirgehan hedef digrin, digel hewldanên ferzkirina dorpêçkirina navendên bajaran û hikûmetê, da ku saziyên dewletê qels bikin û şiyanên wan ên ewlehiyê kêm bikin.



**Berfirehbûna êrişan û windakirina qadên berfireh**

Li gorî Projeya Daneyên Cih û Bûyerên Şerê Çekdarî, herêma Têlabêrî ya Nîcerê di demên dawî de asteke bilind ji tundiyê tomar kiriye, di heman demê de bilindbûneke berbiçav di zêdebûna êrişan hatiye dîtin, ji ber ku rêxistinên cîhadîst operasyonên xwe li dijî sivîlan û hikumetê berfireh kiriye.

Berfirehbûneke zêde ya çekdaran li Malî û Borkina Faso çêbûye, wekî koma Nesrat El-Îslam û El-Muslimîn herwiha rêxistina DAIŞ'ê li beravê, ev yek hişt ku desthilatên van dewletan qadên berfireh winda bikin, li gorî Platforma "Lêkolîna Ewlehiya Efrîqayê" ku îşaret kir li ser qelsbûna kordînasyona herêmî û jihevxistina mekenîzmeyên hevkariya bi koma "Îkwas'ê" re, ku hiştin qada tundiyê berfireh bibe û şiyana komî li hember rawstandina gefan qels kir.

Tevgera DAIŞ'ê piraniya wê di hundirê sînorê di navbera Malî, Nîcer û Borkina Faso de ye, digel berfirehbûnek zelal li bakur û rojhilatê Nîcer, nemaze li herêmên derdora gola Tşadê ku jîngeke erdngarî û ewlehî kur ava dike dihêle tevgera wê hêsan bike.

Koma aloziyên Navdewletî diyar kirin ku çekdar hewil didin ku kontrolkirina xwe li ser gundewaran xurt bike, herwiha zextê li ser deshilatên leşkerî li Malî bike ji berdêla kontrolkirina bajaran bi awayekî rasterast wekî rewşa Borkina Faso.

Vê komê lê zêde kir ku şerê li herêma beravê sînaryoya siyasî guherand, îşaret li ser hêrsa gel kir di encama têkçûna hêzên biyanê bi pêşengiya Fransayê, ji ber nikarîbûna wê di dorpêçkirina komên çekdarî de di salên di navbera 2020-2023'an de ku hişt derbeyek leşkerî li her sê welatan çêbibe.

**Lîbiya vedgere qada rageşî û aloziyan**

Başûrê Lîbiyayê piştî êrişeke çekdarî ya li ser deriyê sînorê El-Tom û hejmareke xalên leşkerî li ser xeta başûr-rojavayê sînorê Nîcer, dîsa li hemberî rageşî û aloziyê ewlehiyê rû bi rû ye, di pêşketinekê de ku mezinbûna zehmetiyên ewlehiyê li hember yek ji herêmên sînorî yên herî zêde jihevketî li parzemîna Efrîqayê, nîşan dide

Başûrê Lîbyayê wekî dergeheke ji tevgerên komên çekdar re ye yên ku ji Nîcer û Malî tên; tê hesibandin, ku herkîna çek û sotemeniyê di rêya Çolbistana mezin misoger dike, di çarçoveya qelsbûna kontrola ewlehiyê û berfirehbûna valahiyê erdnîgarî de, ev yek dikare toreya rageşiyê li herêmê çalak bike û dihêle xeteriyê li ser Lîbyayê zêdetir çêbike ji ber berfirehbûn û ketina komên çekdaran di nava dewletê de, di heman demê de li ser hevsengiya ewlehiya pir xerab a dewletê.

Di heman çarçoveyê de, Benîn û Togoyê hewldanên ketina terorîstan li herêmên bakur tomar kirine, vê rewşê tirs zêde kiriye ku gefên tundiyê bighêjin herêmên beravê yên ku giringiya wan ji hêla aborî hene herwiha bi rêyên bazirganiya navdewletî li kendava Xîniyayê girêdayî ne, dê ev yek berfirehbûna gefê nîşan dide.

## Peymana New Start bi fermî bidawî bû

**Navenda Nûçeyan**

**Peymana dawîn a derbasdar di navbera DYE û Rûsyayê de New Start, roja pêncşemê 5'ê Sibatê bi awayekî fermî bi dawî bû.**

Peymana New Start ya ku di sala 2010'an de hate îmzekirin, derpêş dikir ku her du alî dikarin herî zêde 800 pergalên pekandinê, balafirên bomberdûmana giran û 1550 serikên nukleerî yên stratejîk ên hatine bicihkirin di destê xwe de bigirin. Peymanê di heman demê de di nava xwe de mekanîzmayeke teyîdkirinê dihewand.



Li gel bidawîbûna peymanê cîhan derbasî pergaleke nukleerî ya kêmtir tê kontrolkirin, bû. Bi taybetî jî piştî êrişên Rûsyayê yên di sala 2022'yan de li ser Ûkraynayê dane destpêkirin, çavdêrî di sala 2023'yan de hatin sekinandin û vê yekê pêvajo hesastir kiribû.

**Antonio Guterres bidawîbûna peymanê wekî kêliyeke giring pênase kir**

Sekreterê Giştî yê NY'ê Antonio Guterres bidawîbûna peymana heyî weke "ji aliyê aşitî û ewlehiya navneteweyî ve weke kêliyeke gelekî girîng" pênase kir, herwiha diyar kir ku rîska bikaranîna çekên nukleerî gelekî bilind bûye û got: "Têkçûna destkeftiyên dehan salan, di demeke ji vê xirabtir pêk nayê."

Sekreterê Giştî yê NY'ê bang li DYE û Rûsyayê kir ku bêyî ku zêde wext derbas bibe vegerin ser maseyê û di çarçoveya bêçekkirineke nû de li hev bikin.

Guterres ev yek anîn ziman: "Ji nîv sedsalê zêdetir e cara ewil e ku em bi cîhaneke ku di navbera DYE û Rûsyayê de tu sînorên cebilxaneya nukleerî tune ye re rû bi rû ne."

DYE û Rûsya zêdetirî ji sedî 80'yê serikên nukleerî di destê xwe de digirin. Ji dema Şerê Sar ve ye di navbera her du welatan de hin lihevkirinên têkildarî kontrola çekên nukleerî di meriyetê de bû. Her wiha DYE, di sala 2019'an de ji Peymana Hêzên Nukleerî yên Nîvmenzîl ya di sala 1987'an de li gel Rûsyayê îmze kiribû, vekişiyabû.

**Bertekên navdewletî**

Elmanya jî fikarên xwe li ser bandorên vê gava Rûsyayê anî ziman, di heman demê de Fransa ku yekane hêza nukleerî ya Ewropî ye, bang li welatên mezin kir ku li ser avakirina pergaleke nû ya kontrolkirina çekan a navneteweyî bixebitin, ji ber ku dawiya "New START" tê wateya windakirina sînorkirinên dawî yên li ser cebilxaneyên nukleerî yên herî mezin ên cîhanê ji bo cara yekem ji Şerê Sar ve.

**Bendên peymanê**

Peymana New Start, sîstema dawî ya mayî ya kontrolkirina çekên nukleerî di navbera Dewletên Yekbûyî û Rûsyayê, du hêzên nukleerî yên herî mezin ên cîhanê de ye. Piştî ku bi dehsalan yek ji stûnên sereke yên kêmkirina xetereyên rûbirûbûna rasterast a nukleerî û parastina astek ji îstîqrara stratejîk a navneteweyî bû. Peyman di sala 2010'an de li paytexta Tişîk, Bragê, hate îmzekirin û di sala 2011'an de ket meriyetê. Armanca wê ya sereke ew bû ku sînorên taybetî li ser çekên nukleerî yên êrişkar ferz bike ku hem Washington û hem jî Moskow dikarin bi kar bînin, bi vî rengî îhtîmala karanîna hevbeş a karesatbar a çekên nukleerî kêm bike.

Peyman sînorên hişk destnîşan kir, ya herî giring ku tenê 700 mûşekên balîstîk yên ku parzemînan derbas dike bên bikaranîn, herwiha mûşekek ji binavê bê avêtin û bombebaranên giran, digel herî zêde 1550 serikên nukleerî yên li ser mûşekan hatine bicihkirin û 800 pergalên pekandinê, çi di xizmetê de bin an na.

Peyman giringiya xwe ji mekanîzmayên lêpirsîna ku şandiye digre, ji ber ku wê rê da ku vekolînên meydanî yên hevbeş di navbera her du aliyan de çêbibe, ji bilî danûstandina daneyan bi awayekî dewrî û agahdariyên têkildarî tevgerên çekên nukleerî û ceribandinên mûşekan, ku pileya bilind a şefafiyetê peyda kir û xetereyên hesabên şaş ên stratejîk kêm kir.

# Ciwanên Kurd li Ewropayê piştgiriya Rojava dikin

Ciwanên Kurd yên li Ewropayê dan zanîn ku gelê Kurd li hemû qadên cîhanê bi yek deng û helwestê herikîn qadan, ew deng jî dengê doz û parastina xaka Kurdistanê ye. Herwiha tekez kirin ku ew ê bibin hêza piştgirî û gihandin dengê Rojava ji bo cîhanê.

**Esma Mistefa**

Bi banga seferberiya ku ji aliyê Rojava ji bo tevahiya gelê Kurd li çar aliyên cîhanê hatiye kirin, bi vê bangê re yekbûna gelê Kurd ji bo parastina Rojava derket pêş. Ev yek mohr û bandora xwe ji hemû aliyên siyasî, leşkerî, dîplomasî û ji her tiştî girîngtir bû sedem ku hemû gelê Kurd bibe yek hewlest û yek deng. Ji ber wê jî em bûn şahid ku çawa bi milyonan gel him li Kurdistan û him jî li Ewropayê derkevin qadan û banga bidawîkirina êriş û parastina destkeftiyên Rojavayê Kurdistanê bikin.

Bi taybet li Ewropayê helwestekî gelek xurt û girseyî derket pêş, ev sekna gel yê li Ewropayê da nîşandan ku gelê welatparêz her li kuderê be bila bibe, ji bo axa xwe tu bend û qeydan nas nake. Zêdeyî deh rojan e gel bi hemû hêz û îradeya xwe li kolanane û xwepêşandanên gelek bi heybet dikin. Di nava van çalakî û xwepêşandanan de, bi sedan ji hunermend, rewşenbîr, xwendekar, karker û ciwanên welatparêz beşdar bûn û heya niha jî ev sekin li her derê tê domandin. Têkildarî parastina axa Rojava, sekin û çalakiyên ku ji Ewropayê derdikevin pêş sê ciwanên welatparên yên Kurd Rojiyan Hisên, Ibrahîl Oso û Silava Hemo ji Rojnameya me re axivîn.

**'Li hember siyaseta qirikirinê; Yekbûna gelê Kurd derket pêş'**

Rojiyan di destpêka axaftina xwe de bal kişan ser rêxistinkirina çalakiyên ku li Ewropayê tên kirin û wiha got: "Bi destpêkirina êrişên li ser Rojavayê Kurdistanê re û bi banga giştî ya ku ji bo gelê Kurd li her aliyên cîhanê hatiye kirin re; Kurdên li Ewropayê yekser berê xwe dan qadan û dûrî her tiştî ji bo parastin û piştgiriya axa Rojava beng kirin. Niha çalakiyên ku li Ewropayê tên lidarxistin piraniya wan ji aliyê ciwanên Kurd ku weke çalakvanên Kurd tên naskirin, di heman demê de rêxistinên ku weke Komele xwe di Ewropa de bi cih kirine, têkiliyên wan bi hin saziyên hikumetê, perlementer û partiyên Çepgir re hene. Bi van rêxistinên heyî re tensîq tê çêkirin û xwepêşandan tên lidarxistin.

Di vê pêvajoya ku Rojava têre derbas dibe de yekbûn û helwesta li hember êriş û siyaseta qirkirinê ya li hember gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê tê kirin, derket pêş. Ev xwepêşandan û çalakî dengvedan û bandoreke mezin li ser raya giştî kir û dike. Ruxmî ku em di nava kapîtalîzmeke mizin de jiyan dikin, lê li kêleka wê me netewa, çand û zimanê xwe parastiye. Ev yek bi taybet di van xwepêşandanan de hat diyarkirin."



Rojiyan Hesen

**'Heman zihniyet li her derê li dijî Kurdan tê kirin'**

Di xwepêşandanên ku li Ewropa çêdibin de hin bûyer derdikevin pêş, beriya niha bi çend rojan xortek li ser telefonê bi Kurdî diaxive li per wî çar xort jê re bi erebî dibêjin tu kûrdî, dibêje erê ew çar xort lêdidin. Ne tenê ev bûyer gelek bûyerên din di xwepêşandana de çêdibe û pêşiya raya giştî xuya dibe. Ew hêrsa li hember Kurdan anjî li hember pêkhateyeke ku azadiyê û demokrasiyê dixwazin bi awayekî rêxistinî xwepêşandanên xwe lidarbixin. Ev yek jî rêfleksa wan derdixîne. Di vir de tê diyarkirin ku li Ewropa jî dixwazin li ser gelê Kurd bandor bikin û heman zihniyeta ku li Sûriyê tê dîtin li wir jî pêk bînin."

**Çalakiyên gelê Kurd û bandora wan li ser Ewropiyan**

Rojiyanê da zanîn ku dema ew kodên malperên ku binpêkirin û kiryarên li ser gelê Kurd li Rojava çap dikin, li ser Ewropiyan jî belav dikin û wiha got: "Di çalakiyan de me gelek kodên malperên ku binpêkirin, sûc û kiryarên li ser gel û jinên Kurd hatine kirin çap kirin û belavkirin, ev yek li ser gelê Ewropî jî hat belavkirin. Bi destpêkirina vê çalakiyê re bi rastî gelek guhertin hatin çêkirin, rasterast me hêşt ku gelê Ewropayê bibînin ku ev komên çete çi bi serê gelê Kurd û bi taybet jî bi serê jinê de tînin, hovîtiya wan bibînin û bizanibin em ji bo çi derdikevin qadan. Bi vê yekê re gelek kesên azadîxwaz û demokrat yên Ewropî di çalakiyên me de amadebûn û xwestin di perlamantoyên Ewropî de bibin dengvedana gelê Kurd. Ji ber ku her kes kete ferqê de ku qirkirina gelê Kurd, êriş û hedefgirtina projeya Netewa Demokratîk tên kirin, ev hedefgirtina pirojeya herî dawî ya aştî û civaka demukratîk e."



Ibrahîm Oso

**'Di dilê Ewropayê de deng û doza gelê Kurd bû yek'**

Ibrahîm Oso di rêze axaftina xwe de got: "Em îro bi navê ciwanên ku êdî bêdengiyê qebûl nake, herwiha em bi tûndî êriş û kiryarên hovane yên li ser gelê me li Rojava tên kirin şermezar dikin. Tişta ku îro tê kirin ne pevçûnekî leşkerî ye, ev yekser sûc in li dijî sivîl û jinan e.

Ji qêrînên jinan heya Jin, Jiyan, Azadî û ta berxwedana Rojava dengê gelê Kurd li welatên ku lê koçberbûne bilind bû. Di dilê Ewropayê de dilê gelê Kurd bi hemû partî û saziyên xwe bûn yek, sînor û perçekirinên ku hatine çêkirin bê wate man. Rola ciwanên Kurd îro jî ku ev guhertina hatiye çêkirin hîn zêdetir bibandor bikin û doza xwe veguhezînin hemû welatên cîhanê bi zimanê ku tê famkirin. Bi zimanê hiqûqî û mirovî, herwiha em dengê ku ji kolanan derdikeve bighînin raya giştî û cihê biryardariyê ku em li ser raya siyasî ya cîhanê bandor bikin. Bê guman wê kesek nikaribe li hember îradeya gel û ciwanan derkeve."

Ibrahîm axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Li kolanên Ewropayê çawa ku deng û doza gelê Kurd bûye yek, em ê jî her li kolanan bin da ku em mafê xwe misoger bikin. Di dawiyê de em spasiya gelê xwe yê Rojhilat, Bakur û Başûr dikin ku her kes her parçe bi Rojava re bû yek û em berxwedanî û têkoşîna gelê xwe yê li Rojava pîroz dikin."



Silava Hemo

**'Em ranawestin, heya ku mafê gelê Kurd misoger bibe'**

Silava Hemo li siwêdê jiyan dikin tekez kir ku ew soz didin wê li qadabin heyanî dengê gelê Kurd dighîne cîhanê û wiha pê de çû: "Tu ferq di navbera gelê me yê ku li Rojava li berxwe dide û yê li Ewropayê nîn e, em li vir ji dil bi gelê xwe re ne. Dijmin bila bi tu awayî hêviyan çêneke û bawer neke ku wê ji vir û şûn ve dengê Şoreşa Rojava, dengê gelê Kurd bitepisîne.

Çawa ku li Rojava gelê me ji zarok, ciwan, kal û pîran li qadan e û parastina axa pîroz dikin, em ê jî li vê derê bibin hêza piştgirî û gihandina dengê gelê xwe ji raya giştî û cîhanê re. Kurd yek milet e û yek welat e. Ne mumkine em bê deng bimîn in, em li vir in, em li pişta we ne û emê hertim li ser piya bin heyanî ku mafê me kurdan misoger bibe."






# 'Divê xweparastin û Şerê Gelê Şoreşgerî xurt be'

Welatiyên gundê Girbawî diyar kirin ku di 29'ê Çileya 2026`an de ji aliyê hikumeta demkî û Hêzên Sûriya Demokratîk ve peymanek ji bo mafê kurdan hat îmze kirin, herwiha ev peyman niha bi awayekî piratîkî pêk tê û gotin, "Lê ev yek nabe sedem ku em dev ji parastina xwe berdin, pêwîst e çavê me baş vekirî be û di çarçoveya şerê gelê şoreşgerî de em xwe biparêzin."

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Şêniyên Rojava bi ruhê yekitî û berpirsyariyê tax û kolanên xwe diparêzin, li hember her gefên li dijî xaka xwe amade ne. Herwiha tabûr û komên parastina bajarên xwe ava dikin. Li hember xeteriya dijî hebûnê parastina xwe dikin. Rêveberiya Xweser li hember êrişên çeteyên hikumeta demkî, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên DAIŞ'ê seferberiya giştî ragihand û bang li şêniyan kir ku tevlî berxwedan û parastina rûmetê bibin. Ji 6'ê Çileyê ve çeteyên hikumeta demkî yên bi piştgiriya dewleta Tirk a dagirker êrişên xwe li dijî herêmê ranewstandine, li hemberî vê yekê jî gel rûmet û xaka xwe diparêze.

Di derbarê parastina xak û rûmeta xwe welatiyên gundê Girbawî yê girêdayî bajarê Qamişlo ji Rojnameya me re axivîn.

**'Ev 14 sal in ku me can û bedelên giran ji bo rûmet û xaka xwe daye'**

Îsam Ibrahîm di destpêka axaftina xwe de da zanîn ku rewşa niha li Rojava derbas dibe parastin girînge û wiha domand: "Ji 6`ê Çileya 2026`an û heye roja îro êriş û gefên giran li ser Rojava tê meşandin. Herwiha ev êriş jî wekî ku her kes dizane ji aliyê hikumeta Demkî, dagirkeriya Tirk û çeteyên DAIŞ`ê ve tê kirin û plan kirin. Li ser vî esasî Rêveberiya Xweser seferberiya xwe ya parastinê ragihand, ji dema ku seferberî hatiye ragihandin û heya roja îro xwe parastin dewam dike, ji ber ku xwe parastin ferze li ser milê her kurdekî, ji ber ku îro ger em xwe û xaka xwe ne parêz in, wê kî vê yekê bike, pêwîste ku em rûmeta xwe biparêzin. Ev 14 salin ku me can û bedelên giran ji bo rûmet û xaka xwe daye, helbet wê ne hesan be ku kî bixwaze wiha rehet derbasî ser axa me bibe. Em ji êvarê heya sibê li taxane û parastinê dikin. Hete zarok derdikevin parastinê, ji ber ku dijminê xwe baş naskirine ku dijminekî hov û bêbexte."

**'Pêwîst e roj bi roj xwe parastin xurtir bibe'**

Îsam Ibrahîm di dawiya axaftina xwe de diyar kir di roja îro de peymana 29`ê Çileya 2026`an ji aliyê hikumeta demkî û Hêzên Sûriya Demokiratîk ve hatiye îmze kirin û ketiye piratîkê û wiha pê de çû: "Di 29`ê Çileya 2026`an de ji aliyê hikumeta demkî û Hêzên Sûriya Demokiratîk ve peymanek ji bo mafê kurdan hat îmze kirin, herwiha ev peyman niha bi awayekê piratîkî pêk tê. Lê ev yek nabe sedema ku em dev ji parastina xwe berdin, ji ber baweriya me bi ti hêz û dewletan tune ye. Ji ber vê yekê pêwîst e çavê me baş vekirî bin û roj bi roj em parastina xwe xurtir bikin, îro her kes dixwaze Kurdan qirbike û dawiya wan bîne. Lê em dibêjin ku kurd nayên tune kirin, heya yek ji me hebe wê daxwaze mafê xwe bike û doza Kurd û Kurdistanê dewam bike heya serkeftinê, em bi îrade û hêza xwe bawerin."



Îsam Ibrahîm



Samiya Cemîl

**'Divê xwe parastin û şerê gelê şoreşgerî xurt be'**

Di heman çarçoveyê de Samiya Cemîl destnîşan kir ku li hemberî van şeran, ji bona ku civak xwe biparêze, hebûna xwe ewle bike û azadiya xwe misoger bike, divê parastina xwe bike û wiha got: "Ji roja ku êriş li Rojava tê kirin û heya roja îro, em nerawistiyane, bi şev û roj em parastina xak û taxên xwe dikin, ji bo ku em hebûn û azadiya xwe mesoger bikin, divê xwe parastin û şerê gelê şoreşgerî xurt be. Ji ber vê yekê Şerê Gel ê Şoreşgerî yê li ser bingehê xweparastinê ya hemû mirovahiyê girîng e. Jin û ciwan pêşengê şerê gelê şoreşgerî ne, lewra girînge ku ew xwe di şerê gelê şoreşgerî de kûr bikin û erêkên ku dikevin ser milê wan pêkbînin. Di vê pêvajoyê de ev yek pir bi hêz û xurt bû, jin karîbû rolekî mezin di xweparastinê de bileyize. Ax axa me ye, ne gengaze em axa xwe berdin, heya nefesa dawî em ê li ber xwe bidin."

# 'Bi sed hezaran malbat koçber bûne'

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Rêvebera Meclisa Efrîn û Şehba ya kantona Qamişlo Leyla Hisên diyar kir ku hijmarek mezin ji koçberan li Qamişlo ne, tenê li Qamişlo û Amûdê nêzî 135 dezgeh ji bo koçberan hatiye vala kirin, bi giştî hijmara koçberan ji Hesekê heya Dêrikê bi sed hezaran malbat koçber bûne.**

Li Rojavayê Kurdistan bi hezaran malbat ji sedemên şer û aloziyên ku di heremêde qewimîn, rastî gelek caran li koçberiyê hatin, her wiha ew malbatên koçber jî heya roja îro di nava zehmetiyên jiyanê rû bi rû dimînin.

**'Gelê Efrînê her deqe û sanî bi hêviya vegera Efrînê dijîn'**

Leyla Hisên di destpêka axaftina xwe de balkişand ser gelê Efrînî û koçberiyê û wiha got: "Beriya ku em behsa koçberên Efrînê bikin, pêwîst e di destpêkê de em ji 2018`an de binirxînin ku çawa di wê salê de li Efrînê êrişekî hovane ji aliyê dagirkeriya Tirk û çeteyên wê ve hat kirin, rastiyê de mirov çiqas behsa wan êrişan û bi çi rengî hat kirin, bike wê kêm be. Di şerê Efrînê de 58 roj berxwedaniyekî mezin hat meşandin, ev berxwedanê jî li hemberî çetan û teknîka herî pêşketî yên şer hat kirin. Dewleta



Tirk ji bo ku hêz û gelê me têk bibe, di rojê de 30 belafirên şer radikir ezîmanê Efrînê û bê naber topebaran dikir. Li vir gel neçar me ku bi darê zorê ji malên xwe werin derxistin. Helbet ev koçberî jî ne hesan bû, bi êşekî pir mezin gelê Efrînê berê xwe da Şehba. Li Şehba gelê Efrînê roj bi roj xwe komî ser hev kir, di heman demê de bi rêya meclis û komînan xwe bi rêxistin kir ku her deqe û sanî bi hêviya vegera Efrînê dijîn."

**'Neçar man ku dîsa koçber bibin'**

Leyla di berdewamiya axaftina xwe de tekez kir ku yên destek û piştgiriyê dide hikumeta Sûriyê, dewleta Tirk e û wiha pê de çû: "Di 8`ê Kanûna 2024`an de rêjîma Baas hat helweşandin ku bi planên dewletên navdewletî Ehmed El-şeri (Colanî) yê ku beriya çend sala di nava Elqaidê de bû û dewletên mezin yên cîhan daxwaze girtina wê kirin. Lê di carekî de Colanî hat ser desthilatdariya Sûriyê bê ku gelê Sûriyê nêrînên xwe bijin ango hilbijartin werin çêkirin. Bi hatina Colanî li ser desthilatdariyê alozî û şer zêdetir bû, bi zehniyeteke wiha ku dixwaze Sûrî yek reng, yek al û yak ol be, bide meşandin. Ji roja hatine wî û heya roja îro sûcên şer, komkujî, talankirin û koçberî tê kirin. Ev zehniyek wê Sûriyekî aram û aştî nede avakirin, berovajî wê ku her Sûrî wê di nava pevçûn û aloziyên giran de bimeşe. Ji ber vê yekê dema ku êriş li ser Helebê da destpêkirin, ku di dîroka 6`ê Çileya 2026`an de li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dîsa komkujî, talankirin, ravandin û sûcên şer pê anîn. Her kes dizane yê ku destekê dide vê hikumetê, dewleta Tirk a dagirkere. Lewma gelê ku karîbû xwe ji agir û şer xilas bike, berê xwe dan aliyê Firatê û Cizîrê, da ku xwe bispêrin cihên bi ewle. Lê çeteyên hikumeta demkî û dagirkeriya Tirk berê xwe dan aliyê Firatê û êrişî bajarên wir kirin, êdî ew malbatên ku zêdeyî 3`ê caran rastî koçberiyê hatin, neçar man ku dîsa koçber bibin."

**'Hijmara koçberan ji Hesekê heya Dêrikê nêzî 10 hezar malbat in'**

Leyla Hisên di dewamiya axaftina xwe de wiha anî ziman: "Koçberiya vê carê ji carên din cûdatir bû, ji ber ku ne tenê xelkê me yê Efrîn û Şehba, her wiha di nav van êrişan de piranî xelkê Firatê koçberî Kantona Cizîrê bûn. Hijmara van koçberan pir mezin e, niha ev koçber piraniya xwe li bajarê Qamişlo bi cih bûne, li bajarê Hesekê hijmara koçberan pir kêm bû ji ber ku rewşa bajarê Hesekê jî ne niştecih bû. Bajarê Qamişlo ne ewqas mezine jî ku hijmarek mezin ji koçberan hewandiye. Tenê li Qamişlo û Amûdê nêzî 135 dezgeh ji bo koçberan hatiye vala kirin. Li Terberspî û Dêrikê jî gelek koçber lê kom bûne, lê bi giştî hijmara koçberan ji Hesekê heya Dêrikê bi sed hezaran malbat koçber bûne. Em niha hewl didin ku koçber vegerin cih û warê xwe ji ber rewşa wan roj bi roj zehmetir dibe."

**'Rêxistinên alîkariyê ku bidin koçberan hene, lê ne bi awayekî aktîv in"**

Rêvebera Meclisa Efrîn û Şehba ya kantona Qamişlo Leyla Hisên di dawiya axaftina xwe diyar kir ku yekîtiya Kurdan moral û hêz da tevahî gelê Kurd û bi taybet li koçberan û wiha domand: "Di rastiyê de di şerê dawiyê de tişta ku hat serxistin, yekîtiya gelê Kurd bû, yekîtiya ku niha me dît moralek pir mezin ji me û koçberan re ava kir. Bi taybet gelê Başûr ku bi dehan kerwanên alîkariyê ji miletê Rojava re rêkirin û ev jî gavek pir bi wate bû ji bo gelê Rojava bi giştî. Heya wek vê kêliyê jî hîn dezgeha Xêrxwaziya Berzanî li gel koçberan disekine û alîkariyan ji bo wan pêşkêş dikin. Bêguman gelek rêxistinên alîkariyê ku bidin koçberan hene, lê ne bi awayekî aktîv in, tenê yên ku karî bû bi temamî alîkariya koçberên Rojava bikin, karewanên ku ji Başurê Kurdistanê hatin. Heta alîkarî dan koçberên di malan de bi cih bûne, beriya niha hemû rêxistinên ku alîkarî pêşkêşî koçberan dikirin tenê didan malbatên di dibistan û kampan de."

**Rêxistin û dezgehên ku alîkarî pêşkêş kirin, ev in:**

-Dezgeha Xêrxwazên Berzanî
-Kêr
-Aktêd
-Bilomend
-Sulîderêtî
-Bihar
-May Firam
-Samiyê
-Itiba Bîla Hidûd
-Rojava
-Awat
-Hana Başûr
-Rabîtet Başûr
-Heyva Sor a Kurdî
-Exziyê Alemiyê

# 'Berxwedana Rojava yekrêziya gelê Kurd li Kurdistanê û cîhanê pêk anî'

**Hevserokê KNK'ê Ehmed Karamûs diyar kir ku Kurd di qonaxa hebûn û tunebûna de ne, ji bo wê divê ew îdyolojiyên cuda cuda bidin rexekî û bi berpirsyariya xwe ya dîrokî ji bo Rojava rabin. Ehmed tekez kir ku eger ew bo parastina berjewendiyên neteweyî tev negerin, ew ê bikevin bin webalekê dîrokê ku kes nikare hesabê wê bide û got, "Yekrêziya gelê Kurd li Kurdsitan û cîhanê bo Rojava pêk hat."**

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

Derbarê êriş û planên li ser Rojava, peymana di navbera QSD'ê û hikumeta Colanî de, Hevserokê Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Ehmed Karamûs bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:



**Çi hişt ku bêdengiya navdewletî li hemberî êrişên li ser Kurdên Rojava bê rakirin?**

Êrişên li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê hat destpêkirin û hemû qonaxên wan êrişan bi mebesta komkujî û koçberî pêk bê û destkeftiyên ku li Rojava hene, bi hemû reng û şêwazê xwe ji holê bê rakirin. Ji ber vê sedemê Kongra Netewî ya Kurdistan ji roja pêşîn ve biryara seferberiyê ji bo Kurdên li her çar parçeyên Kurdistanê, diyaspora, Ewropa û hemû cîhanê ragihand. Encamên seferberiyê çi li Kurdistanê û çi jî li derveyî welat ew bû ku bi deh hezaran mirov daketin kolanan, qadan û piştgiriya gelê xwe bi hemû rengî kirin, ew piştgirî jî her berdewam dike. Ya girîng ewbû ku di destpêkê de bêdengiyeke navdewletî ji bo piştgiriya Rojava hebû, lê xwepêşandan û serhildanên Kurdan li tevahiya cîhanê, bû sebebê ku ew bêdengiya navdewletî ji holê bê rakirin.

**Armanca êrişên li ser Rojava çi bûn?**

Encamên ku îro li Rojava derdikevin holê, encamên lihevkirin û rêkeftineke navdewletî li hemberî gelê Kurd û destkeftiyên gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê ye. Ev lihevkirin di serdanên Ehmed El-Şara, dewleta Tirk, rayedarên dewleta Tirk, Siûdiyê û rayedarên Qeterê li NY pêk hatin. Di pey vê serdanê re, serdana Şara bo Donald Trump serokê Amerîka, ev yek bo me diyar kir ku bi dîplomasî û derfetên dewleta Tirk, Siûdiyê, Qeter û heta rolekî Engilîza jî di vê rêkeftinê de esase. Di heman demê de encamên van hevdîtin û rêkeftinan, hebûna Şara li Sûriyê rewa kirin ku êdî li gel hev dû kêşeyên Sûrî çareser bikin. Di kêşeya Sûrî de mijarên cuda cuda derketibûn holê ku li milekî Durzî û li milekî Elewî wekî beravê devera Tertoz û Lazqiyê diyar bû ku heta radeyekê ew teslîmî Îsraîl bû. Tevlîbûna Îsraîl jî her çendîn rayedarên Îsraîlî dibêjin ku me rêkeftineke di 4'ê Çileya 2026'an de li Parîsê pêk anîbû, lê mijara pirsa Kurd û Rojavayê Kurdistanê nehatiye holê û me tu carî çiryaya kesk an jî lihevkirinek li ser vî tiştî nekiriye, tenê lihevkirina me li ser mijarên peymana Îbrahîmî ye ku hin deverên başûrê Sûriyê teslîmî Durziya û Îsraîl bikin. Lê rêkeftina ku li Parîsê pêk hat, bû sebebê ku çirayeke kesk ji bo Tirkiyê, HTŞ'ê, El-Qaîdayê û DAIŞ'ê bê sitendin. Her çendîn navê DAIŞ'ê bi fermî di nava hêzên xwedê giravî artêşa Sûrî de tuneye, lê her kes pê serwexte ku DAIŞ jî beşek ji lihevkirina artêşa Sûrî ye. Hem jî ew bi xwe navê artêşê lê dikin, lê di rastiyê de tu rêbazekî artêşekî tê de tuneye.

Ev her du rêkeftin bi hev re û encamên ku ji van rêkeftinan derket, bû sedem ku hikumeta HTŞ'ê, rayedarên wê, giropên bi ser Tirkiyê ve û Tirkiyê bi xwe jî, hem ji Amerîka hem jî cesaret ji vê peymanê wergirtin û dest bi êrişên berfireh kirin. Ji ber ew pê bawer bûn ku li hemberî van êriyan, raya navdewletî li gel wan in û bi tu şêwazî wê li hemberî wan tu tedbîr, dijberî an jî ku li dij rawestin, nekin. Di bingeh de wan bo xwe plansaziyeke istratîjîk destnîşan kiribûn ku wê çawa destpêkê li hêzên Rojava bidin û hemû derfetên di destê gelên me yên Rojava de, ji dest wan derxînin, lewma ji Şêxmeqsûd û Eşrefiyê wergiritin û heta gihaştin vê radeyê. Di heman demê de wa diyar bû ku hêzên Ereb ên di nava QSD'ê de li Dêra Zorê, Reqa, Tebqa û deverên din de ji demeke dûr û dirêje peywendî û lihevkirineke wan a veşartî li gel dewleta Tirk, Qeter û Siûdiyê hebûn, ne ku di rojekê de wiha bû.

**Gelo armanc tenê Şêxmeqsûd, Eşrefiyê û deverên Kurdan bû, yan planekekî cuda heye li ser Kurdan?**

Dema ku êriş li Şêxmeqsûd û Eşrefriyê dest pê kirin û bi şêwazekî sîstematîk li Dêra Zorê, Tebqa, Reqa û heta bi beşekî mezin ji deverên din xwestin bistînin. Lê armanca wan ya dawî ku tevahiya Rojavayê Kurdistanê bidin ber xwe û bixin bin Kontirola xwe de. Lê di baweriya min de ev êrişên ku bi ser Kurdan de hatin û heta deverekê rawestiyan, herwiha danûstendin û diyalog ji nû ve dest pê kirin, ne ku tê bêje piştgiriyeke navdewletî ya wek berê ye. Lê hêza Kurd a her çar beşên Kurdistanê û îradeya şervanên azadiyên YPG û YPJ dan diyarkirin ku êriş rawestin û dest bi diyalog, danûstendin û mizakereyan bikin ku di encama wê de jî peymana îro derket holê. Mebesta min hêza Kurd, Kurdên li her çar beşên Kurdistanê û derveyî welat e. Di vê pêvajoyê de gelê Kurd bi çalakiyên xwe, daketina qadan û meydanan li hemû deverên cîhanê û li her çar beşên Kurdistanê yekrêziya xwe dan nîşandan û ev yekrêzî tirseke mezin xiste dilê dijmin.

**Gelek caran hevdîtin û peyman di navbera QSD'ê û hikumeta Colanî de pêk hatin, lê ji aliyê HTŞ'ê ve pêk nedihatin, sedemên wê çi bû? Girêdayî peymana dawî hatî îmzekirin di navbera QSD'ê û hikumeta HTŞ'ê de tu çawa dinirxîne?**

Ji 10'ê Adara 2025'an û vir ve çendî caran hevdîtin û muzakere pêk hatin, çend peyman jî hatin îmzekirin, ji wan peymana 10'ê Adarê, 1'ê Nîsanê, 18'ê Çileyê pey wê re jî hin lihevkirin di danûsitandinan de derdiketin. Lê piştî çend rojan an piştî hefitiyekê tu wateyek wê lihevkirin, rêkeftin û peymanê nedima. Ji ber mudaxeleya dewletên weke Tirkiye, Siûdiyê, Qeter û îngilîz jî di nav de, dihişt ku ew tu erêkirinekê bi peymanan nekin. Lewma derbarê vê lihevkirina ku berî çend rojan hate tomarkirin, tiştekî xwezayî ye ku gelê Kurd ji tecrûbeyê xwe û ji helwestên dijmin bawerî bi vê hikumetê neyne. Em niha ji bilî naveroka peymanê baş an nebaş tiştekî nizanin. Lê ji bo vê peymana heyî gerek em ne ewqasî xam, bê tecrûbe an jî nayîfbin ku em ê bêjin va lihevkirinek çêbûye û em ê têkevin nava rehawetekê. Pêwîst e em hemû tedbîr, ewlekarî, danûstandin û çalakiyên xwe çi li derveyî welat û çi jî li nava welat dibe berdewam bikin. Ji ber eger em berdewamiya vî tiştî nekin, ew dikarin sînalekî wiha fam bikin; ev lihevkirin ne bi dilê Kurda ye, Kurd ew bi tenê hiştine û wê carekî din cesart bigirin û êrişî Rojava bikin. Heger ji dest wan bê jî wê hemû Rojava bixin bin Kontirola xwe de.

Her çiqasî baweriya me bi şervanên azadiyê heye ku wê berxwedanê û bergiriyê bikin, lê divê em hemû tiştî jî bidin ber çavên xwe. Wê demê jî êdî çi li pêşiya me ye yan em ê heya yek mirovî li ser vê xakê berxwedaniyê bikin ku ew jî encamên wê çi be wê diyar bibe, yan jî divê ku tu Rojava bi carekê re vala bike û teslîmî wan bike. Dema şerek wiha hat, divê em her du îhtîmalan li ber çavên xwe bigrin. Ji bo wê gerek em bi wî rengî lê binêrin û analîz bikin ku ger rewşeke din derkeve holê. Eger rewşeke ne erênî hat, encamên wê jî ji bo gelê Kurd wê gelekî xerba bibe, pêwîst e em her tim li ser van ihtîmalan rawestin. Ji ber vê sedemê pêwîst e em di asta siyasî, dîplomasî, muzakera, berxwedanê û piştgiriya gelê Kurd li tevahiya cîhanê, ji bo Rojavayê Kurdistanê tu sistiyê nekin, şev û roj em berdewam bikin.

**Têkoşîna gelê Kurd li çar parçeyên Kurdistanê û cîhanê ji bo Rojava têkoşîneke çawa bû û vê têkoşînê çi da avakirin?**

Gelê Kurd li her çar beşên Kurdistanê û cîhanê biçûk, mezin, jin, mêr, kal û pîr, bê ferq û cewaziya siyasî, îdyolojî piştgirî û berxwedaneke mezin bêhempa ji bo Rojava dikin, ev di asta gel de ye. Gel vî tiştî dixwaze û vê peyamê bo me diyar dike ku pêwîst e em di asta siyasî de hêviyên gelê xwe, pêwîstiyên têkoşîn û xebatê pêk bînin. Herwiha eşere bû ku gerek yekrêzî û yekîtiya me hebe, em derdora istratîciyeke hevbeş bicivin. Ji bo vê sebebê Kongreyî Netewî Kurdistan pirsa Konferansek niştîmanî ji bo vê babetê nîqaş bikin, demildest gerek em vê yekê bikin. Ji bo wê niha danûstandinên me bi hemû partî û rêxistinên siyasî yên Kurdistanî re dest pê kiriye û xebata me li ser vê berdewam e, ku ev pirseke em nikarin bi şûn ve bixin. Hêvî û daxwaza min ji hemû partî û rêxistinên siyasî, kesayet û saziyên civakî re ku em vê berpirsyariya dîrokî bi paş de nexin, tu hinceta nedin pêş ji bo ku em vê Konferansê pêbînin. Ev konferas em bi hişmendî û hesasiyeta neteweyî û niştîmanî bikin, mijarên îdyolojî yên cuda cuda bidin alî, ji ber qonaxa em tê de ne, qonaxa hebûn û tunebûna gelê Kurd e. Em baş pê dizanin eger Rojava şikest û têk biçe, em sedî sed bawerin wê dijminê me ev lihevkirina istartîjîk ku di asta her çar dewletên dagirker ji berê de heye, wê ew hemû destkeftiyên gelê Kurd çi li Başûr, Bakur û Rojhilat dibe wê hewl bidin ji holê rakin. Ji ber vê sedemê ev demek dîrokî ye, heger em bi erk û berpirsyariya xwe ji bo parastina berjewendiyên neteweyî bi hev re tev negerin, emê bikevin bin webalekî dîrokê ku tu kes nikare hesabê wê bide.

FENER



## Serkeftin Balansa Azwerî û Pratîkê Ye

**Idrîs Henan**

Mirov ji bo ku şiyana jiyankirinê bi hêztir bike û bibe kaniyeke moral a berdewamiyê, li beramberî nebûnê hinek xalên hebûnê destnîşan dike. Li gorî qonax û serdeman, her yek ji van xalan dibe jêderek domandina razber û şênber a mirovatiyê. Herwiha, li gorî şert û mercên çandî, cografî û gerdişên dîrokî, nav û têgînên cuda li van xalan tên kirin. Lê di encamê de, hemû jî navê Serkeftinê lê tên bar dikin.
Her çend peyva Serkeftin di wateya tîgînî de wek sade û normal xuya bike, lê di cewherê xwe de gelek wateyên cuda li xwe digire. Di wateya xwe ya klasîk de, Serkeftin bi têkbirina aliyekî ji aliyekî din re tê pênasekirin; ango têkçûna aliyekî beramberî aliyekî din e. Lê pirsa sereke ew e: Gelo ev pênase dikare wek şert û bingehê Serkeftinê were qebûlkirin?
Rewş û encamên ku nikarin di navbera azwerî û pratîkê de hevsengiyan biafirînin, nabin Serkeftin. Mirovek ku nikare bi xwe re rast be, bê vîna jiyanê be û bi xwe re li hev neke, nikare serkeftinê bi dest bixe. angu, mirovê ku hêza wî ya parastina nirxên xwe tune be, di bingehê xwe de bêdestkeftî ye. Dibe ku eserekî wî hebe, lê ne xwedî serkeftin e. Gengaz e hinek tiştan bi dest bixe, lê ne destkeftiyên mayînde ne. Dikarin bi her kêliyekê re jî veguherin têkçûnek mezin. Di encamê de, mirov xwe iqna dike ku serkeftinek mezin bi dest xistiye, lê ev iqnakirin di cewherê xwe de bi encamek rastîn re li hev nayê.
Bi rastî, Serkeftin xwedî pîvanên razber û şênber e. Pîvanên ku li ser têgînên biyanî, idîayên hêsan ên rêjeyî têne avakirin, ti carî nikarin naveroka rastîn nîşan bidin. Pîvanên rastîn tenê ew in ku di çarçoveya zanîna mirov de, bi bandora rastîn a eserên li ser erdê re, dikarin bihêlin mirov bibêje: "Ez bi ser ketime". Ya girîngtir jî ew e ku mirov bizane ku Serkeftina mutleq nîne. Serkeftin, di bingehê xwe de, rêzezincîrek ji hewldanên berdewam ên avakirina balansa girêdayî şert û mercên heyî ye. Ji ber vê yekê, Serkeftin dibe stasyoneke demkî, ne encameke dawî û bêguhertin.
Divê were zanîn ku Serkeftin tu carî nayê wateya ku mirov xwe xirabtir bike, baweriyên xwe wenda bike, bi kîn û nefret derewan li xwe bike, an jî metodên fikirî û bingehên ideolojîk ên ku destkeftiyên mezin li ser wan ava bûne, bêwate bike. Ev nêzîkatî taybetmendiya kesayetên ku di hundirê xwe de binkeftî ne ye. Têgihiştin û baweriya wan a Serkeftinê têkçûye û bi bêhêvîmayînê re rûbirû mane.
Di şertên niha de, bi taybetî piştî encamên êrişên çeteyên HTŞ û dewleta Tirk li ser herêmên xweser ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û bi taybetî Rojava, têgîna Serkeftinê bi cil û bergên cuda derketiye holê. Civak an mirovê ku bi xwetawanbarkirinê re bijî, bi demê re dogmatic dibe û têgihiştina wî/ê li ser Serkeftinê şaş dibe. Di vê zihniyetê de, hesabên Serkeftin û binkeftinê bi rêyekî rast ava nabin. Serkeftin ne bi wêne, slogan an belavokên ku li ser dîwar û malperên tevna civakî tên belavkirin tê pîvan. Pîvana rastîn a Serkeftinê, encamên rastîn ên li ser erdê ne. Pîvan; şertên siyasî, aborî û leşkerî û şertên ku di navbera aliyan de terazuyek nû çêdikin e. Tevî hemû êriş, teknelojî, îxanet û milîtarîzkirinê, armanc û daxwazên neteweyî yên gelê Kurd wek xwe parastî ne. Berovajî, ji her demê bêtir, gelê Kurd biryara yekîtiya neteweyî daye û ev biryar li ser erdê pratîze bûye. Ger ev rewş ne Serkeftin be, wê gavê mirov dikare çi navekî din lê bike?



# Ji çiraxên wêjeya Kurdî

**Can Yûsif**

Nivîskar Lema Elî "Dengê jina kurd ya ku ji êşê hêviyek hûnand û ji bêdengîyê awazek afirand."
Helbestvan û nivîskarên kurd ên hevdem di rêyên wêjeyê û çandê de şemaleka geşbûn. Wan vedenga çiyayan û stranên gundiyan di xîmava pênûsên xwe de û di awazên dengên xwe de hildigirtin, afirandinên wan ne tenê kiryarek hunerî bû, lê berxwedanek bi peyv û parastinek ya nasname û bîranîna kurdî bû. Bi rêya helbest û nivîsarên xwe, wan xêzên bîranîna gelêrî vehûnandin, kelepûr ji jibîrkirinê parastin û nirxên kurdayetî jî zindî hiştin di dil û hestên nifşên pêşerojê de. Bi vî rengî, peyv di destên wan de veguhêrî keleha bîranînê, helbest bû pirek ku paşerojê bi dema niha ve girêdide û nivîsên wan bûne çekek ku zeng negire û penahek ji giyanan re û welatek ku neyê talankirin.
Di vê çarçoveyê de, helbestvana kurd Lema Elî wek yek ji van dengên pêşeng dixuye, ya ku pênûsa xwe kiriye di xizmeta gelê xwe û doza wî de, Peyvên wê bûn çiraxek ji bo nasnameyê û neynayek ji bo hêvî û xewnên neteweyek ku li azadî û rûmetê xwe digere.
Nivîskar û helbestvana kurd Lema Elî, di sala 1974'an de ji dayîk û bavek kurd (Zehra û Mihemed) li gundê Şêro yê girêdayî bajarê Dêrikê hatiye dinyayê, ew bajarê ku dikeve di sêkoçkiya sînorî, li ser sînorên di navbera Bakur, Başûr û Rojava de, ya ku bûye şahidê veguhêrîna şaristaniyan û hembêzkirina çandan ji destpêka dîrokê ve.
Dêrîk ne tenê bajarek sînorî û vedere, ew bûye û hîn jî maye dergûşek ji bo nivîskar û helbestvanên ku bi diwêta pênûsên xwe peyvên herî bedew di pesindana Kurdistan û axa wê ya pîroz de nivîsandine, wekî (Ehmed Şêx Salih, Elî Çilaxa, Lorî Teldarî, Omer Elî û şehîd Rizgar û hin din) yên ku helbest kirine welatek û peyv kirine nasnameyek. Lema Elî di jîngehek wêjeyî, hunerî û ramyarî ya bereketdar de têgihiştiye û ji zarotiya xwe ve bênxweşiya xakê û germiya çîrokan di hilmijî û di nav malbateke kurdperwer, welatparêz û kedkar de mezin bû, ku ji heft bira û pênc xwişkan pêk tê, dê û bavê wan ew li ser nirxên kurdayetiyê ên resen, li ser dilsoziya ji bo xakê, baweriya bi azadiyê û wefadariya bo nasnameyê ew firşik kirine. Ji bo wê, malbat yekem dibistana hişmendî û rûmetê bû. Wê stranên Kurdî yên kevnar di wê de dibihîstin û di navbera çar dîwarên malê de helbestên ku dayîkê ezber kiribûn bilind dibûn, wekî ezberkirina ayatên nimêjê û axaftina bav li ser welat û azadiyê, mal tije dikir, wekî ku dibistanek be her êvar di nav wan de waneyek e li ser evînê, wefedarî û welatparêzî dida. Di wê jîngeha dewlemend bi ruh û bedewiyê de, hinêra wê ji temenek piçûk ve destpêkir, ew bi cîhana peyvê heyran bû; dixwîne, dinivîse û her tiştê ku di xeyal û hestê wê yê nazik de bala wê dikişîne dinivîsand û belge dikir, heta paşê bû dengek wêjeyî yê jinana taybet û naskirî, bi wê rê yê wê derbirîna pirsgirêkên mirovahiyê, jin û milet dikir û îsbat kir ku gava peyv ji dilê bawermendekî bi azadî û jiyanê derdikeve, ew ji hemî qeyd û bendê rastiyê bihêztir e. Jîngeha erdnîgarî û çandî li ser avakirina dîtina wê ya edebî û mirovahî bandorek kûr hiştin, gundê Şêro, ku dikeve di himbêza Dêrikê de, ne tenê wargehek biçûk bû, lê qadeke fireh û vekirî bû ku tê de bedewiya xwezayê, hêzbûna mirovan û hezkirina wan bi yê din re hatibûn himbêz kirin di civakekî corbicor û pirreng ji milet û zimanan.
Li wir, di navbera zeviyên pembo û bênderên genimê zêrîn de, di nav bêhnxweşiya xaka şil bûyî bi barana zivistanê, bîra wê ya pêşîn hate vekirin li ser dîmenên gund û gundewarên kurdî. Li wê derê, lavijên mizgeftan bi stranên folklorî re û sirûdên jinan di qadan bi awazên şivanan re di çîmenan de tevlîhev dibûn, ji wir, hest û hişmendiya wê a pêşîn hatiye afirandin ku çîrok yek ji şêwazên hebûnê ye, û parastina bîrdankê wekî kiryarek berxwedanê tê dîtin, ku ne kêmtir e ji têkoşîna bi çekan. Gava ku malbat çû Qamişlo - dayîka bajarên çandê yên li Rojava - Lema xwe di wargehek nû ya vekirî û pir reng de dît, wê salên zarokatiya xwe di nav taxên wê yên kevnar, kolanên wê yên teng û xaniyên wê yên ax de derbas kir û bi vî awayî ezmûna wê, hest û hişmendiya wê zêde bû. Li wir, wê ruhê bajarê pir-ziman û pir-çand vexwart û dît ka nasname çawa ji pirrengiyê tê avakirin û azadî çawa di hilmije di himbêza cudahiyê de, di bin şertên qedexekirina perwerdehiyê û dorpêçkirina li ser jinan hatî feriz kirin de, hiş û xeyalê wê hate vekirin ji çîrokên ku dapîran di şevên zivistanê ên dirêj û sar de digotin li ber pizotên agir, ew fêr bû ku peyv dikare bîranînekî xilas bike û çîrok ne keyfeke, lê şêwazek ji şêwazên berxwedana çandî ye.
Hîn ji zaroktiya xwe ve, hewesa wê ya xwendin û derbirînê dest bi zelalbûnê kirin, ew di demjimêrên dirêj bi xwendina çîrokên Erebî û yên wergerandî mijûl dibû, hewl dida ku wan bi nivîsarên kurt îfade bike û pê hestên xwe yên yekemîn li himberê cîhanê nîşan bide.
Bi vî rengî gavên xwe yên pêşîn di rêya wêjeyê de bi rêbazek pêbawer û bi hişmendiyek hîn zû destpêkir ku peyv yekem deriyê azadiyê ye, û çîrok bîranîna gelane ku qet namire.
Nivîskar û helbestvan Lema Elî ku li dijî qeyd û bendên qedexeya xwendinê derket, dest bi rêwîtiya xwendinê kir di derveyî dibistanên fermî de; ew yekem car tevlî dibistanên jêbirina nexwendîbûnê bû, dûvre wê pola pêncemîn û şeşemîn bi hev re xwend, berî ku bigihêje pola nehan û bawernameya amadekariyê wergire û dema ku temenê wê gihişte 35 salan, ew carek din vegeriya da ku rûpelek nû di rêwîtiya xwe ya perwerdehiyê de xêz bike, wê bawernameya amedahî di beşa edebî de wergirt û paşê tevlî Kuleja Aboriyê li Zanîngeha Firatê di bajarê Hesekê de bû; lê mixabin rewşên ewlehiyê nehiştin ku xwendina xwe bidomîne.
Piştî wê, xwendina xwe di navbera salên 2016 û 2017'an de li Zanîngeha Rojava, beşê Ziman û wêjeya Kurdî li Qamişloyê domand, û di sala 2018'an de qedand, di dilê xwe de vedenga zanînê, ziman û mîrateya çanda kurdî hilgirt bû. Ew şeş salan xebitî wek mamoste di Akademiya Şehîd Egîd de, berî ku dev ji qada perwerdehiyê berde û xwe bi tevahî terxan bike ji bo pênûs û afrîneriya xwe, ew helbest û çîrokan bi zimanên Kurdî û erebî dinivîse û di nivîsên wê de, evîna wê ji bo kurteçîrokan, helbest û lêkolînên edebî diherike, ew bi dilsozî mîrasê kurdî û nasnameya neteweyî diparêze, da ku wêjeyê bike pirek di navbera bîrêweriya çandî û giyanê mirovahiyê de û peyvê bike tîrêjek ku rêyên azadî û zanînê ronî bike.
Di warê lêgerîn û lêkolînan de, nivîskara kurdî Lama Elî çend lêkolînên edebî nivîsandine di derbarê kesayetên edebî, efsaneyên kurdî û çîrokên gelêrî de, di nav wan de jî: Destana Derwêş û Edûlê, Memê Alan, Zembîlfiroş, Evdalê Zeynikê, Xatûna Şamê, Zumred Xan û Mestûra Kurdistanê hebû, heft ji van lêkolînan bûne belgefîlm û li ser ekranê Ronahî TV hatine weşandin, evê yekê hebûneke wêjeyî ya girîng di qada çandî û medyayê de da wê.
Di heman demê de hinek lêkolîn û çîrokên wê di rojname û kovarên çandî yên cûda de hatine weşandin, wekî:( Şermola, Sêwan, Metîn, Dîstar), ku nîşan didin berfirehîya hevdîtin û bandora wê di dîmena wêjeyî û çandî ya kurdî de.
Ji nav berhemên wê yên wêjeyî yên bi zimanê kurdî hatine çapkirin:
1- Hestên Seyr-Helbest- weşanên J&J-2022- Amed .
2- Henase –Kurteçîrok - weşanên Şilêr-2023- Qamişlo.
3- Berbang – Gotar –weşanên Şilêr-2025- Qamişlo.
Ew beşdarî gelek festival û şevbuhêrkên edebî bûye û gelek bawernameyên rûmetê û xelatên rêzgirtinê ji derdorên edebî ve wergirtine. Di sala 2018 de, wê xelata sêyemîn ya çîroka kurdî di Festîvala Wêjeyî ya Osman Sebrî de wergirt, bi çîroka xwe ya bi navê "Leheng" .
Di sala 2021'ê de jî, wê xelata duyemîn di Festîvala Heftemîn a Çîrokê ya Kurdî de ku ji hêla Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyê tê rêxistin, bi çîroka xwe ya bi navê "Goristan" wergirt û bi vê awayî ku hebûna xwe di nav nifşek nû yê edebî de piştrast kir ku hevbexşiyek di navbera resenî û nûvekirinê de çê dike. Lama Elî ew endamek ya Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistan ê (HRRK) ye û herwiha jî endamek ya Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê ye, wê gelek hevdîtin û hevpeyvîn bi kanalên Ronahî TV û Rojava TV re kirine û beşdarî gelek festîval û şevbuhêrkên edebî bûye.
Hebûna wê çavkaniyek girîng di dewlemendkirina dîmena çandî ya jinên kurd ên hevdem de afirand û bi wê rêyê wê hêza jinên kurd destnîşan kir ku peyv kire kiryareke hebûn û afirîneriyê.
Lema Elî ne tenê helbestvaneke, lê ew nivîskar, çîrokvan û lêkolînereke xwedan dîtinîyek edebî ya berfireh e, di rêwîtiya xwe de wê nîşan da ku jina kurd dikare sînor û sengeran derbas bike û tiştê ku nemumkine dikare bi rêya peyv, afirandin û zanînê pêkbîne. Wê wêje kire amûrek ji bo isbatkirina xwe û pênûs kire amrazek ji bo hebûn û berxwedanê, tekez kir ku afirînerî tu zayend û sînoran nas nake, lê belê kiryarek vîndarî, hişmendî û bawermendiye dikare veguhêrînê çêbike.
Wê serî ne çemand li ber şert, merc û astengiyan, ew bi israr û biryardarî di rûyê wan de rawestiya, heta ku bû yek ji dengên jinên navdar ên Rojava, û semboleke jina kurd a berxwedêr û azadîxwaz.
Îro ew di bilindahiya dayîn û afirandina xwe ya wêjeyî de ye; çîrokan dinivîse, helbestan vedihûne û romanan bi hewesek qet kêm nabe dide ristin û pênûsa xwe dike xizmeta gelê û doza wî de.



# Li Dêrazorê bihabûna nan û mazotê

Piştî vekişîna Rêveberiya Xweser ji bajarê Dêrazorê bi awayekî giştî û kontirolkirina wê ji hêla hikumeta demkî ya Şamê ve, kelûpelên bingehîn nemaze sotemenî (mazot, gaz û nan) bihabûn.

**Lîloz Hisên/Qamişlo**


Li gorî çavkaniyên herêmî û nûçeyên ku li ser torên civakî belav dibin, nirxê lîtreyek mazotê li Dêrazorê bi qasî 3500 lîreyên Sûrî bilind bûye û gihaştiye 8000 lîreyan, herwiha nirxê lîtreyek gaz gihîştiye derdora 10000 lîreyên Sûrî. Bihayê wê li gorî dema bihûrî nêzîkî sê qat ji asta berê zêdetir e. Di heman demê de welatî ji bona dabînkirina nan pir zor û zehmetiyê dibînin. Herwiha welatî bi fikarin ku di demên pêş de rewşa heyî hîn zortir bibe û nerazîbûnên xwe li hemberî vê yekê anîn ser ziman.

Piştî ku hikûmeta demikî ya Şamê zeviyên petrolê yên li Dêrazorê, bi taybetî zeviya stratejîk a El Omer, zeviyên El Tenek, Konîko, El Cefera û El Eziya, ku berê di bin kontrola Hêzên Sûriya Demokratîk de bûn, kontrol kir, bihayê sotemeniyê sê qatê bihayê berê ku dihate firotin hate zêdekirin.

Niştecihên bajarê Dêrazorê û gundewarên wê bi pêlek sermayê ya bêhempa re rû bi rû ne, di heman demê de xirabûna rewşa jiyanî û bibilindbûna bihayê sotemeniyê rewşa heyî hîn aloztirkir. Rewşa heyî welatî hîn bêtir bêzarkirin û êdî bû hisreta wan ku malên wan germ bibe û nanekî bi rehetî bixun.

Çalakvanên Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûriyê bilindbûneke berbiçav di buhayê "Mazotê" de li bazara reş tê dîtin. Ji ber buhayê yek lîtreya sûtemeniyê ji hêza kirîna kesên xwedî dahata bi sînor derbas dike. Nemaze piştî rawestandina dabînkirina Mazotê ya rafînekirî û guhertina nexşeya kontrolê li ser zeviyên petrolê yên li herêmê.

### Kêmbûna mazotê û bandora wê li ser niştecihan



Li gorî agahiyên ku ji milê saziya Mafê Mirovan ve hatine belavkirin, welatiyek ji taxa El-Cûra ye dibêje: "Meaşê min têrê nake ku ez 20 lître Mazotê bikirim; zarokên me dicemidin û ji ber ku ji me nayê em mazotê bikrin, em karton û plastîkan dişewitînin da ku em xwe pê germ bikin". Êş tenê bi kêmbûna sotemeniyê ve sînordar nemaye, lê di heman demê de demjimêrin pêxistina aletirîkê jî kêmbûne. Ji ber ku hikûmet fatûreyên xerckirinê yên pir buha li ser niştecihan ferz dike, di çarçoveya bernameya rasyonê ya dijwar ku dighêje seatekê li hember qutkirina 5 seatan, ku niştecihan ji karanîna sobeyên elektrîkê wekî alternatîfekê ji bo sotemeniyê bêpar dike.

Jina bi navê(Diya Ehmed) ji Çavdêriya Mafê Mirovan re tekez dike ku pêwistiyên germkirinê hîn negihiştine wan, ev yek hiştiye ku koçber ji bo germkirinê xwebispêrin şewitandina daran û bermahiyan.

### Çavdêriyê ji bo xeteriya domandina vê rewşê hişyarî da

Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûriyê hişyariyê dide li ser xetera berdewamiya vê rewşa tirajedîk û bandorên wê yên neyînî li ser tenduristiya mirovam û jiyana welatiyan, nemaze zarok, kal û pîran, yên ku ji ber hewaya sar û nebûna rêbazên germkirinê yên ewle, xeteriya nexweşiyan li ser wan zêde dike. Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyê tekezî dike li ser pêwîstiya dîtina çareseriyên lezgîn, da ku sivîl ji xeteriyên vê rewşa xirab dûr bikevin. Herwiha tekez dike ku pêwîst e pirsgirêkên xizmetguzarî û mirovî ji her hevkêşeyên siyasî an leşkerî dûr bikevin, di heman demê de misogerkirina gihandina pêwistiyên serek ji sotemenî û elktirîkê ji bo hemû herêmên Sûriyê bêyî ferq û cudahî.



### Nerazîbûn û hêrsa gel

Çavkaniyên herêmî ragihandin ku buhayê lîtreyek mazotê ji 3500 lîreyên Sûrî gihiştiye 8,000 lîreyan, di heman demê de buhayê lîtreyek gazê gihîştiye derdora 10000 lîreyên Sûrî, ku ev yek bandoreke neyînî li ser welatiyan çêkiriye, nemaze bi nêzîkbûna serdemên ku pêdiviya sotemeniyê ji bo xebitandina jenerator û makîneyên çandinî û xizmetguzariyê zêde dibe.

Niştecihên Dêrazorê hêrs û nerazîbûna xwe li hember vê zêdebûna tûj, ji ber bandora wê ya rasterast li ser şert û mercên jiyanê û xizmetguzariyê nîşan dan. Di demekê de ku daxwazên bidawîanîna rewşa aloz a ku tê jiyan kirin û baştirkirina mekanîzmayên çavdêriyê. Ev yek di demekê de tê ku nerazîbûn li çend bajarên Sûriyê zêde dibe, ku di hefteyên dawî de xwepêşandan li wir hatine lidarxistin û daxwaza kêmkirina buhayên sotemenî û elektirîkê û sivikkirina barên aborî yên zêde dibin tê kirin.

### Astengiya peydakirina nan

Bi bihabûna nirxê mazotê re, nirxê nan jî hate buhakirin û ev yek bû sedem ku alûziya ku tê jiyakirin hîn bêtir kûrbibe. Qutkirina mazotê û ard li ser firneyên ku li Dêrazorê kar dikin bû sedem ku gelek firneyên ku nan çêdikin rawestin. Ji ber vê yekê nirxê nan yek ser buhabû û ev rewşa heyî rasterast bandor li ser jiyana welatiyan kir.

Li gorî Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûriyê tenê li bajarê Hecînê hejmareke kêm ji firneyan dixebite, gundewarên derdora wê bi awayakeî giştî li wê deverê nayê peydakirin. Ji ber vê rewşa ku jiyan kirin welatî neçar dimînin ku berê xwe bidin kesên ku nan difroşin, her kîsek nan jî bi nirxê 5000 heya 6000 lîreya Sûrî tê firotin. Hêjayî gotinê yek ku ku li Dêrezorê di dema rêveberiya xweser de kîsê nan bi 3000 lîreyê Sûrî bû.

### Gelek firne ji ber nedana mazotê û ard êdî nikarin kar bikin

Firneyên giştî di encama qutkirina piştgiriya mazot û ard e, ji kar Rawestiyan û di demekê de ku firneyên taybet li bajarê Hecînê bi zextên bazara reş re êş dikşînin, ku giraniya nan kêm dibe û buhayê wê zêde dibe. Ev rewş rasterast bandorê li ser tevgera sûkê û kirînê ya niştecihan dike û bû sedem ku nerazîbûnek berfireh li seranserî gundewarên rojhilatê Dêrazorê derkeve holê.

Li gorî Çavdêriya Mafê Mirovan a Sûriyê ku yek ji niştecihên bajarê Hecînê ji wan re gotiye ku xebitandina firneyan hatiye rawestandin ji dema vekişîna Rêveberiya Xweser. Di dema rêveberiya xweser de nan bi nirxê 3000 lîre dighaşt şêniyên bajêr, lê îro di bazara reş de bi buhayê 5000'an kîsê nan dikrin ku û ev yek ji bona hemû welatiyan rewşa heyî hîn zortir dike. Di heman demê de yek ji şêniyan destnîşan kir ku hîn ew li benda sozên aliyên peywendîdarin da ku rewşa wan ya jiyanî baştir bikin û buhayê nan were kêmkirin û tekez dike ku alozî zêde dirêj kiriye û şênî daxwaza girtina tedbîrên acil dikin ji bo parastina mafên wan û peydakirina pêwistiyên wan yên sereke.

### Bê nan û sûtemenî debara jiyanê nabe

Nan wekî kelûpelek stratejîk û xeta sor ji bo gel tê hesibandin, ji ber ku hebûna wê bi jiyana welatiyan û aramiya civaka heremî ve girêdayî ye. Her ku alozî berdewam dike, fikarên li ser xirabûna rewşa mirovî ya li herêmê zêde dibe. Di çarçoveya nebûna tedbîrên acil ji aliyên peywendîdar ve ji bo misogerkirina gihandina piştgiriyê û şopandina bihayê kelûpelên heyî li bazarê. Girtina berdewam a firneyên nan û bilindbûna berbiçav a buhayê wê nîşan dide ku qeyraneke bingehîn di dabînkirina pêdiviyên herî bingehîn ên jiyanê de tê jiyan kirin. Ji bo pêkanîna aramiyê li gundewarên rojhilatê Dêrazorê herwiha ji bo misogerkirina ku nan bi buhayekî guncav bigihîje hemû niştecihan, pêdivî bi tedbîrên lezgîn ji rayedarên peywendîdar heye.



# Hevgirtina gelê Kurd planên dagirkeran vala derxist

Rojava ku bi îradeya kolektîf a gelê xwe di serdemên herî tarî yên Rojhilata Navîn de hatiye damezrandin, îro ne tenê bi êrîşeke leşkerî, lê di heman demê de bi êrîşeke pir dijwar a qirkirinê re rû bi rû ye ku ol, neteweperestî, berjewendiya navneteweyî û dirûtiya herêmî bi hev ve girêdayî ne.

**Amara Baran/Qamişlo**

HTŞ'ê bi hevkariya dewleta Tirk û komên cîhadîst ve di 6'ê Çileyê de herdû taxên Helebê yên ku Kurd têde dijiyan dorpêç kirin. Bi hemû hêz û teknîka xwe gelê ku li herdû taxan dijiya hedef girtin. Piştî ku Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ji milê hêzn dagirker ve hat dagirkirin. Vê carê berê xwe dan qadên ku di sala 2014-2015'an de ji aliyê şervanên YPG-YPJ'ê ve hatibûn rizgarkirin û êrîşên dijwar birin ser wan herêman. Rûxmê ku gelek caran agirbest hat ragihandin, lê dagirkeriya tirk û çeteyên Hemzat, Emşat û Nûredîn Zengî rûxmê agirbestê jî êrişên xwe nerawestandin. Ev êrîşên li ser heremê planeke bêbextiya dîrokî ye ku li dijî hebûna gelê Kurd, destkeftiyên wan ên demokratîk û modêla civakî ya herêmê tê kirin e.

### Hevgirtin û yekîtiya gelê Kurd hesabê dagirkeran têkbir



Hêzên hegemon ji bo ku projeya Netewa Demokratîk têk bibin, hemû hêza xwe kirine tevgerê ku planên qirêj pêk bînin. Gelê Kurd ji bo şikandina vê plana qirêj, pêwîst e hevgirtina xwe hin xortir bike. Ji bo pêşerojeke hevpar, ji bo aşitî û aramiya gelan, divê tovê hevgirtinê yên di nav gelan de bê çandin. Li hemberî hêzên dagirker gelê Kurd ji heftsalî heyanî heftî salî tev di yek çeperê de bûne yek û li ser erdê yekîtiya gelê Kurd pêkhat. Gelên ku bi hezaran salan bi hev re dijîn, ji bo bîranîn, hevgirtin û jiyana hevpar a bi sedsalan, divê nebin qurbanên planên hêzên heremî û cîhanî. Ji bo şikandina vê planê, îro bi taybetî li Kobanê û Rojava ku bûne kelihên berxwedanê, pêwîste ku gelê kurd û cîhan tevahî li dora vê berxwedanê bibe yek. Pêwîste ku hemû pêkhateyên ku li heremê bi hevre dijîn li hemberî vê bêbextiyê û planên qirêj yên hêzên dagirker



û çeteyên wê biseknin û yekîtî û hevgirtina gelan biparêzên.

### Berxwedan bi ser ket

Gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku ji 6'ê Çileyê ve heta niha bi êrîşên qirkirinê re rû bi rû ye bi îrade û hevgirtineke xurt hemû êrîş û planên hêzên dagirker û çete valederxistin. Bi rihê Kobanê û serkeftina wê ya 2014'an carekedin dîrokê xwe ji nûve vejîn kir. Tevahiya Cîhanê ji berxwedanî û têkoşîna gel re şahidî kir û berdêlên giran ji bona parastina destkeftiyên Rojava hatin dayîn û tucarî gelê Kurd ji bona parastina destkeftiyên xwe gav paşve navêje. Ne tenê Rojava li çar parçên kurdistanê gelê Kurd bi yekbûyina xwe ispat kir ku çi dibe bila bibe wê Rojava were parastin. Ji tifaqa partiyan zêdetir tifaq û yekîtiya gelê Kurd û gelan pêkhat û li ser asta kurdistanê û cîhanê tevahî yekîtiya kurdan û dostên wan pêkhat. Gelê kurd bi şev û roj û li her çar parçeyên Kurdistanê û Ewropayê ku rabûn ser piyan û herî girîng jî bi saya cangoriyên fedayî yên keç û xortên kurd ên di çeperan de xwîna xwe fedakirin, hişt ku Amerîka, Brîtanya, Fransa, Almanya û hwd bi daxuyaniyeke hevpar dan û agirbest ragihandin.

### Plana hêzên dagirker a parçekirin û qirkirina gelan binket

Armanc ew bû gelê kurd were qirkirin û destkeftiyên ku bi xwîna şehîdan pêkhatîn werin tunekirin û di navbera hemû gelên ku li heremê bi hevre dijîn şer û pevûn çêbibin û rewşa heyî alûzbibe. Hedef ew bû ku gelê Kurd li hemberî êrîşên dagirkeiya tirk û çeteyê wê bi tena xwe bimîne û vîna wî were şikandin, lê bi berxwedaniya gelê Kurd û şervanên YPG û YPJ'ê û bi piştgiriya gelê Kurd li hersê parçeyên kurdistanê, kurdên li ewropa û dostên gelê kurd, hemû plan hatin pûçkirin.

Wê hertim vîn, hevgirin û yekîtiya gelan bi serbikeve û wê biratiya hemû gelên li Sûriyê û rojhilata navîn bi hevre dijîn li hemberî hemû hewildanên hêzên hegemon û yên heremî bê encam bimîne.

# Rojava bû wijdanê cîhanê!

**Volqan Elî**

Ji 6'ê meha yekê ya 2026'an ve li Sûriyeyê tiştên ecêb diqewimin û hê jî ev pêvajo berdewam e. Wekî dibêjin 'ev yeka siltanê ker jî bihîstiye'. Ji ber vê yekê dibe ku ne hewce be mirov ji destpêkê ve hema çi rû daye bîne ziman.

Her çendî me gotibû, dibe ku ne hewcebe bûyerên qewmîne ji destpêke ve werin îfadekirin, lê ji bo ku cihê xwe bigre mirov dikare bi çend gotinan bîne ziman: Peymana 10'ê Adarê ya di navbera QSD û Şamê de tê zanîn. Ji bo ku ev were nîqaşkirin û paşê bikeve meriyetê di navbera van herdu hêzan de, li Şamê, di rojên destpêkê yên meha yekê ya 2026'an de nîqaşek dihate meşandin. Lê belê dema ku dagirkeriya Tirk dest lê werda her tişt li bin guhê hev ket. Jixwe, ev rewş ne tenê bi dagirkeriya Tirk ve têkîldar e: Dema ku di 4'ê meha yekê ya 2026'an de li Parîsê, bi navbeynkariya DYE'yê di navbera Şam û Îsraîlê de peymanek hate çêkirin hêzên navneteweyî bi neyekser jê re rê vekirin ku çeteyên dagirkeriya Tirk û Şamê êrîşê herêmên Rêveberiya Xweser bike.

Ji ber ku ev pêvajo pir zêde hate tehlîlkirin û tê tehlîlkirin jî em ê zêde li ser vê mijarê nesekinin. Em dixwazin li ser encama vê bisekinin: Gava ku çeteyên dagirkeriya Tirk û Şamê êrîşên ku nehatî dîtin li ser herêmê dan destpêkirin tiştekî sosret û balkêş çêbû: Yekîtiya Kurdên çar aliyên cîhanê. Dema em vê dibêjin, ne ji bo ku bibe şiyarekê, bi temamî di rastiyê de wisa bû. Bi destpêkirina komkujiyên li ser Şêxmeqsûd re yekîtiya Kurdan ku hêzên siyasî bi dehan sal nikaribûn ava bikin hate avakirin. Angu Kurdên Kerkûk heta bi Kanadayê heman helwest nîşan dan: Ji bo parastina Rojava serîhildan! Bê guman di dîrokên cuda de helwestên bi vî rengîi bi pêş ketine. Lê negihaştine asteke wisa bi domdar û biryardar.

Ya din jî bi taybetî li diyasporayê (penabertî-jiyana mişaxtî) rabûna gelê Kurd bi dostên xwe, hê jî mezintir û watedar bûye. Heta bi vê derê tiştekî neyê naskirin wekî ku tinebe xuyaye. Gelekî mazlûm ê wekî Kurdan li parçeyê herî biçûk ê wekî Rojava bi neheqiyekê ve rû bi rû maye û Kurdên li çar aliyên cîhanê û mirovahiya azadîxwaz a cîhanê jî lê xwedî derdikeve. Bi rastî di vê dîmenê de zêde tiştekî ecêb tine. Ya ku bi pêş biketa herî kêm divê ev bûya. Di mercên nêzîkî asayî de wisa ye: Lê mercên cîhana serdema me qet jî ne wisa ne: Faşîzma Hitler û Mosoloni, li cem pergala ku niha li ser cîhanê hikim dike wekî ku sed carî bi ava Zemzemê hatibe şûstin bê guneh e! Wisa ye… Ev gotina me ne mubalaxa (zêde nîşandan) ye û ne jî neheqiyek e. Çima? Bersiva vê pirsê pergala cîhanî bi xwe dide. Van rojên dawî di çapemeniya cîhanî de mijareke bi navê 'Dosyaya Epistein' tê belavkirin. Em bi kurtî bêjin, tê gotin ev dosya ji milyonan rûpelan pêk tê. Dîsa li gorî ku dibêjin, cezîrek hatiye avakirin û li vê derê ku wekî cihekî gerûgeştê tê tarîfkirin, ji xwarina goştê mirovan heta bi destdirêjiya li ser zarokan û nizanim çi, çi… her tiştê ji derveyê exlaqa mirovahiyê hebûye. Tu yê bêjî muxatabê van tiştan kî bûye? Em nabêjin, yên ku van îdîayan belav dikin bi xwe dibêjin. Ne ji wan be ma em ê bêbextiyeke wisa çima û çawa bikin. Ji ber ku ne made û ne jî mejiyê mirovan van gotinan radike: destdirêjî û xwarina goştê mirov û hezar tiştên din. Mînak, Bill Clington û Hilary Clington ku demekê rêveberiya DYE bûn, Barrakê ku balyozê dewleta Tirk e û gelek rayedarên Ewrûpî navên wan derbas dibe.

Niha bi van gotinan armanca me ne ew e ku em îftirayekê bikin, yan jî tiştekî din. Jixwe mijara me jî ne 'Dosyayên Epistein' e. Em dixwazin wê bêjin ku vaye serhildana xwedî derketina li Rojava di heman demê de Hewldana Mezinkirina Wijdanê Mirovahiyê ye. Ji ber ku dîktatoriyên ku faşîzma Hitler jî li ber wan wekî zarokekî bê guneh dimîne, di van mercan de bi têkoşîna xwedî derketina li Şoreşa Rojava di dilê hemû mirovahiyê de, bi têkoşîna xwe ya bêhempa, tovên rehmê diçînin.

# ‘Em ê çalakiyên hevbeş bi rêxistinên mafên mirovan li dar bixin’

Serokê Forma Almanî-Kurdî Yûnis Bhram da zanîn ku ji bo piştgiriya Rojava formê li gelek bajarên Almanyayê gelek xwepêşandan û çalakiyên girseyî bi rê ve birin, herwiha têkiliyên siyasî yên berfireh bi partiyên bi bandor û parlamentoyan re pêkanîn û got, “Ji bo Rojava em ê çalakiyên hevbeş bi rêxistinên mafên mirovan ên navdewletî li dar bixin.”

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Forma (Korbenda) Almanî-Kurdî saziyeke civakî, çandî, siyesî ye ku li Elmaniyayê kar dide meşandin, di sala 2017’an de hate avakirin, bi armanca ku korbend bikaribe ji bo doza Kurdî bandorekê li Elmaniya çêbike.

Derbarê xebata Korbenda Almanî-Kurdî ji bo piştevaniya Rojavayê Kurdistanê, serokê wê Yûnis Bhram bersiva pirsên rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**-Erka Forma Almanî-Kurdî di warê piştevaniya gelê Kurd li Rojavayê Kurdistanê û parçeyên din çi ye û çi xebatê dide meşandin?**

Forma Kurd-Almanyayê saziyeke ji bo xebatên siyasî û têkiliyên dîplomatîk re eleqedar e, ew saziyeke ne fermî ye. Bi armanca ku di nav civakên Ewropayê de bibe dengê Kurdî yê azad, xebatê dike. Form diyaloga Kurdî-Almanî wek dirûşma xwe dipejirîne, ev yek jî li ser bingeha girîngiya pêkanîna pêwendiyan bi civaka Almanî û saziyên siyasî re, hem jî hewldana wê ya derbarê çareserkirina pirsgirêka Kurd de ye. Form hat avakirin da ku bibe kelehek li hemberî polîtîkayên Tirkiyê yên ku zextê li ser civaka Alman dikin, poltîkayên ku dihêlin pirsgirêka Kurd berovajî bibe da ku bandorê li raya giştî û biryardaran bikin. Di vê çarçoveyê de, form roleke aktîv di şirovekirina pirsgirêka Kurd de nav qadên siyasî û medyayê dilîze, ligel vê jî têkiliyên dîplomatîk û bidestxsitina toreke bi bandor a pêwendiyan ava dike. Ev yek jî bû alîkar û guhertineke erênî ya berbiçav di warê helwestên gelek aliyên bibandor de hat encamdan. Piştî Forma Kurdî-Almanî cara yekem di dîroka Kurdan de bi navê Rojavayê Kurdistanê bi fermî ji hêla Serokê Konferansa Ewlekariyê ya Miyûnxê ve hate vxwedndin, gavên balkêş avêtin pêş. Formê beşdarî civatên Konferansa Miyûnxê ya 2025’an bû, herwiha bi amadebûna serokên dewlet û wezîrên derve yên ji çar aliyên cîhanê konferans pêkhat. Vê beşdarbûnê bandoreke girîng a siyasî û medyayê ava kir û hişt ku dengê Rojava bigihêje platformên navdewletî yên herî girîng. Formê beşdariyeke berbiçav û çalak di civatên çend konferansên navdewletî de yên li



Nemsa û Swîsreyê hatin lidarxistin, pêkanî. Li wir Forma Kurdî-Almanî beşdarî nîqaşên girîng ên siyasî, ewlehî û mafên mirovan bû û di çarçoveya biryardayîna navdewletî de pirsgirêka Kurdî, bi taybetî pirsgirêka Rojavayê Kurdistanê, di çarçoveya biryardayîna navndewletî de kir rojeveke domdar û bi vî awayî hebûna xwe di nav qada Ewropa û navdewletî bi hêz kir.

**-Wekî tê zanîn di dema dawî û heyî de Rojavayê Kurdistanê derbasî rewşeke pir zehmet bû, hemû aliyên Kurdî, sazî, rêxistin û partiyên Kurdî destek dan Rojava, gelo Forma Kurdî-Almanî ji bo Rojava çi kar û xebat da meşandin û gelo xebata ku hate kirin çi encamên baş bi xwe re anîn?**

Ji destpêka êrişên dawî li ser Rojavayê pêkhatin, Forma Almanî-Kurdî çalakiyên xwe li ser astên siyasî, medya û civakî zêde kir. Me civîn rasterast bi parlamenterên Almanya û Ewropî re li dar xisitn, herwiha li ser rewşa mirovî û ewlehiyê ya herêmê dozên siyasî û hiqûqî pêşkêş kirin di heman demê de em beşdarî kampanyayên piştgiriyê, semîner û konferansan bûn da ku rastiya Rojava û tişta ku lê diqewime ji raya giştî ya Ewropayê re şirove bibe. Form li gelek bajarên Almanyayê xwepêşandan û çalakiyên girseyî bi rê ve birin, têkiliyên siyasî yên berfireh bi partiyên bi bandor û parlamentoyan re pêkanîn. Van hewldanan, bi taybetî di dema dawî de, bandor li ser helwestên siyasî yên girîng kirin, di nav de daxuyaniya birêz Armîn Laşît, berpirsê têkiliyên derve li Yekîtiya Demokratên Xiristiyanî, tê de piştrast kir ku Kurdên Rojavayê Kurdistanê xwedî maf in ku herêmeke xweser di nav Sûriyaya federal a nenavendî de ava bikin. Ev helwest xwedî dengvedaneke berfireh a siyasî bû û bandoreke zelal li cihê biryardayînê yên Tirkiyê kir.




**-Di warê piştgiriya Rojavayê Kurdistanê de astengiyên ku derdikevin pêşberî we, hem jî çi pilanên ji bo dema pêş ên Forma Kurd-Almanî hene û wê çi gav bên avêtin li ser asta navdewletî?**

Pirsgirêkên ku em rû bi rû ne gelek in û tevlihev in, di serî de nebûna helwesteke navndewletî ya zelal li ser tiştên ku Rojava tê re derbas dibe. Li gel van helwestan tevlîhevkirina berjewendiyên herêmî û navdewletî heye, gelek caran jî li ser hesabê mafê gelê Kurd tên pêkanîn. Em rastî bi kampanyayên rêxistinkirî yên propgandayên dûrî rastiyê tên, di heman demê de çapemeniya objektîf ku rastiyê derxîne tuneye. Li hêleke din, wekî her saziyeke sivîl ku bi çavkaniyên sînordar dixebitin û rastî astengiyan tê, em jî li hemberî pirsgirêkên teknîkî û lojîstîkê re rû bi rû dimînin. Lê belê zehmetiya herî mezin ji bo me ew e ku hin szaiyên Rojavayê Kurdistanê ne alîkar in, em gelek caran kêm dimînin sedem jî têkilî bi saziyên biryardar ên Kurdî re zehmet dibe, ev mijar bandoreke xerab li xebata hevpar dike, tevî ku piştgirî li ser asta Ewropayê ji vê xebatê re heye. Di dema pêş de em ê çalakiyên xwe li ser asta navnetewî, bi taybetî di nav Yekîtiya Ewropayê de bi rêxistin bikin. Em ê konferans û komxebatên hevbeş bi navendên lêkolînê û rêxistinên mafên mirovan li dar bixin, hem jî têkliyeke xurt bi Kurdên diyasporayê re xurt bikin. Di heman demê de zextên siyasî û çapemeniyê bidomînin ji bo parastina destkeftiyên Rojava û misogerkirina piştgiriya siyasî û mirovî ya domdar. Projeya sereke ya forma me ya istratejîk, avakirina Zanîngeha Navneteweyî ya Kurd li Almanyayê ye, em vê yekê wek gaveke girîng di rêya xebata neteweyî û sazûmanî de dibînin. Konferansa me ya duyemîn ku di Cotmeha 2025’an de li bajarê Dresdenê hate lidarxistin, di vî warî de gaveke girîng bû. Wekî din Forma Kurdî-Almanî li Almanyayê derbarê têkiliya bi beşên perwerde û karûbarên xwendekaran re xebitî. Di warê qebûlkirin û naskirina bawernameyên lîseyê yên xwendekarên Rojava de pêşketinên berbiçav pêkanîn û bi vî awayî derfetên nû yên perwerdehiyê ji xwendekarên Kurd re vekir. Em li vir tekez dikin ku Zanîngeha Kurdî ya Navneteweyî ne tenê saziyeke perwerdehiyê ye, ew lêvegereke sazûmanî ya Kurdî li qada Ewropayê ye, hem jî gaveke istratejîk e ji bo xurtkirina qadên akademîk û siyasî yên Kurdî li Ewropayê. Rojava di pêşerojek nêzîk de wê bibe yek ji wan çend herêmên kêmpeyda ya aram û bi ewle. Ew ê di hundirê erdnîgariyeke ku dibe armanca pevçûnên mezhebî yên pilankirî, ev şer wê di navbera Şîe û Sunniyan de were pêkanîn. Di heman demê de wê hewldanên vejandina komên radîkal, di serî de DAIŞ, ji bo ku careke din kaos derkeve pêş, ji Sûriyê, Lubnan û Îraqê dest pê bike, heta Îranê.Li Rojavayê, em rû bi rû ne ku ezmûnên tehl mîna Îraqê bijîn, li gel vê yekê jî wê tecrûbeyên pêşketî yên Kurdan ku dersên girîng bi xwe re tînin, bibin rojev. Ji ber vê yekê divê Kurd bi giştî û bi taybetî li Rojava bêtir hişyar bin û ji bo pêşerojeke tije zehmetî, amade bin û ji bo xurtkirina yekîtiya xwe û avakirina sazî, destkeftî û aramiya xwe bixebitin.



## Gelê Kurdistanê çi got?

**Ahmet Aktaş**

Divê gotina gelê Kurdistanê weke mesaj neyê dîtin, belê weke ferman were dîtin!
Jiber ku gel, ji gotin û bangên rêxistinan û kesan pirtir, guh dan bangên hev, bi gotinek din gelên parçeyên din û yên derveyî welat guh dan bang û daxwaza dilan û kezebşewitiyên Rojava û li hêviya ti kes û rêxistinan ranewestiyan, li kesî hovenedan, berê dan Rojava û çûn hewara xuşk û birayên xwe yên li dijî kurdkujan û neyarên mirovahiyê bi qehremanî liberxwe didin. Li pêşiya xwe, sînor jî weke asteng nas nekirin, xwe li sînoran jî dan û meşiyan xaka pîroz Rojava.
Ji al û dirûşmên partî û rêxistinan pirtir, alên bi navê Kurdistanî dihatin naskirin hildan, bi giranî jî alên zelal ên yekser rengên KESK-SOR-ZER ên Rojava hildan û dirûşmên “YEK E, YEK E, YEK E, KURDISTAN YEK E” û Bakur, Başûr, Rojava, Rojihat e Kurdistan Yek Welat e” qêriyan! Gelê me ye Rojava, xwe da ispat kirin ku Bûye gelekî xwedî îrade û hişmendiya netewa demokratîk! Di hest û helwestên girseyên gel de 3 mijar-3 têgîn derketin holê: WELATPERWERÎ, NETEWPERWERÎ û MIROVPERWERÎ. Şwîna kesperestiyê, parçeperestiyê û cudaperestiyê, civakperestî, Kurdistanî û yekrêzî derket pêş! Di dirûşme, bang û awurên wan de bawerî, wêrekî û ruhê serhildêrî gelek bilind dihat dîtin, weke ku bi serkeftinê ve hatibûn kilîtkirin diqîriyan û diqîrin.
Pêşewaziya Parêzgerê Hisiça Nureddin Îsa Ehmed bi Ala Rojava, gelek balkêş û watedar bû û herwiha ev bûyer, weke mînakek nîşaneya serkeftinek dîrokî bû.
Ji ber, cara yekê ye ku fermî weke nûnerê gelê Kurd, kesekî Kurd, di asta parezgeriyê de dibe erkdar, lewma bi coş û dilxweşî weke şahiyek serkeftinê hat pîroz kirin!
Bi kurtayî asta hişmendî û vîyana gel bilind bûye, lê dîsa jî divê dev ji hişyarî û amadekariyê neyê berdan. Ji ber ku xeter hê jî dewam dike, lewma divê ji berê bêhtir hişyarî û amadekarî hebin, heta ku deskeftî, mîna statuyek fermî di asta navneteweyî de jî neyê misoger kirin û bingeha xeteriyan neyê hilweşandin, divê piştealayî, xemsarî û sistayî nebe.
Erê qonaxek nuh a dîrokê destpêkiriye û nîşanên qezenckirinan û deskeftinan zêdetir bûne, lê divê herkes ji xeteran re û ji deskeftinan ên nuh re jî, amade bin !
Li pey gava Hisiça, gavên entegrasyonan li Qamişlo û hinek deverên din ên Rojava dane despêkirin. Helbet armanc û biryara Rêveberiya Xweser û bi giştî Tevgêra Azadiyê, ENTEGRASYONA POZITÎF e, lê bêgûman armanc û zihniyeta Şamê, Entegrasyona Negatîf e. Ev nakokî, tê wateya ku; têkoşîna siyasî û dîplomasî bi hemû hêz û hostayiya xwe didome! Divê di vê qonaxê de jî hişyarî û hostayî di radeya herî bilind de were meşandin, da ku serkeftina mayînde û erênî pêkwere! Di vê mijarê de mînaka vê dawiyê ya çûna heyeta ENKSê ya Şamê, ma ne balkêşê? Daxwaza hevdîtina Şandeya Konferansa Qamişlo ya bi navê Rojava qebûl nakin, lê belê bi lez ENKSê dişînin Şamê! Divê pêşengê vê pêvajoya dîrokê neyê jibîrkirin ku Rêber APO ye û gotibû: ROJAVA XETA MİN A SOR E! Fermana gel û ya Rêber APO bûn yek!



# ‘Alîkarî ne madî bû, gihandina hêvî û palpiştiya hev bû’

Endamê Dezgeha Xêrxwaziya Berzanî Rawaj Hacî da zanîn ku nêzî 350’î kamyonên alîkariyê û 150’î karmend derbasî Rojava bûne û got: “Ji gelek aliyan ve alîkarî bo Rojava hat, herwiha biryara derbaskirina alîkariyê ne tenê madî bû, gihandina hêvî û palpiştiya hev bû.”

**Zana Roj/ Qamişlo**

Dezgeha Xêrxwaziya Berzanî bi destpêkirina êrişên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê re û bi koçberiya gelê Kurd yên ku li bajarê Tebqa û Reqayê diman re, dest bi derbasbûna alîkariyê bo Rojava kir. Dezgeha Xêrxwazî ya Berzanî ku weke dezgeheke fermî li ser asta Kurdistanê tê naskirin ku ji bo pêşkêşkirina alîkariya mirovî li gelek bajar û herêmên ku ziyanên di encama felaketên xwezayî, şer û pevçûnan hene, derbas wan deveran bûne û alîkarî pêşkêş kirine. Ev yek bi fermiyet û bi displîneke gelek xurt ji aliyê ekîbeke mezin ve tê organîzekirin.
Bi êriş û hedefgirtina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê hikumta demkî ya Sûriyê û komên çeteyên girêdayî wê ve di meha Çileyê de ku ev rêze hedefgirtin bi şerê li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Kurdan re dest pê kir û di 18’ê Çile de berê xwe dan herêmên Rêvebriya Xweser yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Bi banga seferberiyê ji bo Rojavayê Kurdistanê ji bilî derbasbûna gelê Başûrê Kurdistanê bo Rojava gelek alîkariyên Locistî, xwarin, sotemenî û tenduristiyê ji herêm û gelê ku berê xwe dane Kantona Cizîrê re hat pêşkêşkirin.
Têkildarî kar û xebata ku ji aliyê Dezhega Xêrxwazî ya Berzanî li Rojava hatiye û tê meşandin, li gel Rojnameya me Rawaj Hacî endamê Dezgeha Xêrxwazî ya Berzanî herwiha serpereştê dosiya Rojava û Kurdistanê, axivî.



**‘150’î karmend û 350’î kamyonên alîkariyê derbas bûn’**

Rawaj wiha dest bi axaftina xwe kir: “Dezgeha Xêrxwazî ya Berzanî piştî 21’ê Çile tevî zêdetirî 150’î karmendên xwe ve derbasî Rojava bû. Nêzî 67 kamyonên alîkariyê me derbasî Rojava kir. Bi derbaskirina alîkariyê re, şazdeh tîmên me yên alîkariyê hatin avakirin û li Qamişlo, Hesekê, Tirbespiyê, Dêrik, Rimêlan, Amûdê, Girkê Legê û Dirbêsiyê û herwiha li hemû bajar û navçeyên Rojava hatin belavkirin. Heyanî niha 350’î kamyonên alîkariyê gihîştine Rojava.”

**Xebatên ku têne meşandin**

Rawaj destnîşan kir ku ji bilî alîkariya xwarin û vexwarinê alîkariyên tenduristî û hwd jî derbas bûn û wiha bilêv kir: “Ji bilî belavkirina alîkariyên xwarin û vexwarinê, tîmên me yên tenduristî, locistî û yêm çêkirina xwarina germ hatin avakirin. Van tîman bi awayekî herî baş û xurt heyanî vê kêliyê jî kar dikin. Bîlancoyên gelek zêde hatine ber destê me ku heyanî niha jî di hemû alî de, her roj ev bîlanco têne nûkirin ka çiqas hatiye belavkirin, çiqas xwarinên rojane tên çîkirin û çiqas gel sûdê ji van alîkariyan




werdigrin.
Di nava alîkariyên ku em pêşkêş dikin de, pêdiviyên zarokan ji şîr, cil û bergan jî pêk tê. Her wisa betanî û pêdiviyên jiyanî yên ku her malbatek pêwîstiya xwe di vê rewşê de pê heye tê belavkirin. Tîmên xwarina germ her roj xwarinê amade dikin û li ser koçberên di dibistan û mizgeftan de ne belav dikin. Helbet ev yek her roj tê domandin. Di heman demê de ji bo pêşkêşkirina alîkariya tenduristî tîm hene, ambolans û klînîkên gerok hatine amadekirin û her roj bi erkên xwe radibin. Ev tîm bi hezarên welatiyên koçber re bûne alîkar, hem di aliyê dermanan de hem jî di aliyê nexweşî û birîndaran de jî gelek alîkarî tê kirin.”

**‘Ji gelek aliyan ve alîkarî ji bo Rojava gihîştin destê me’**

Rawaj di axaftina xwe de diyar kir ku gelek aliyên din him ji derve û him jî ji Başûrê Kurdistanê alîkarî pêşkêş kirin û wiha domand: “Gelek hewildan û insiyatîfên komkirina alîkariyê ji bo Rojava li Başûrê Kurdistanê hatin kirin. Bi taybet ji kampaniyên li Hewlêrê û Kanala Rûdawê jî alîkariya xwe amade kir û gihîştin destê me. Ji alîkariyên derve ku gihîştine ber destê me nêzî 118 kamyonî hatin Rojava. Herwiha ji Silêmaniyê ji Kerkûk û her cihekî insiyatêfên şandina alîkariyan ji bo Rojava didomin. Bi vê wesîleyê em her kesî, her komele û aliyên ku xwestin alîkariyê bikin spas dikin û em dibêjin ev alîkarî amanetin û wê bighîjin destê gelê me.”
Rawaj di berdewamiya axaftina xwe de ev got: “Ev pêngav gelek mezin bû, hêvîdar in ku ev hevgirtin her wisa berdewam bike. Biryara Serok Berzanî ya ji bo gihandina alîkariyê ji bo Rojava ne tenê biryareke madî bû, bi rastî biryara gihandina hêvî û palpiştiya hev e. Ji bilî vê wê alîkariya me bighêje Heleb û Efrînê jî ku ofîsên me li wan deveran jî hene.”
Rawaj di dawiya axaftina xwe de spasiya piştgirî û palpiştiya Heyva Sor A Kurd û stadyom û Parka Azadî kir ku di vê pêvajoyê de hemû bi hev re bûn alîkar da ku bikaribin xebatekî baş bikin.

**Bîlancoyên dawiyê yên pêşkêşkirina alîkariya Dezgeha Xêrxwaziya Berzanî**

Xwarinên Germ: 59 hezar û 375 wecbeyên xwarinên germ li ser koçberan di 296 dibistan û 17 mizgeftan hatine belavkirin.
Alîkariyên giştî: 9 hezar û 664 malbatan jê sûd wergirtiye li 178 dibistan û 12 mizgeftan hatine belavkirin.
Belavkirina sotemeniyê (mazot): 8 hezar û 908 malbat jê sûd wergirtine, li ser 234 dibistan û 12 mizgeft bi hejmara 325 hezar û 582 lître hatiye belavkirin.
Tîmên tenduristiyê: 5 hezar û 582 kesan jê sûd wergirtiye li 73 dibistanan.
Her wiha derfeta kar ji bo 655 kesan re hate vekirin da ku bi dezgehê re li Rojava kar bikin.

